# DILNAME

**9**

**1-9-2011**

*Rojnameyeke Rewşenbîrî ye Serbixwe ye - www.dilname.wordpress.com*


## ZAROTIYA NEYNIKEKÊ Û TIŞTIN DIN

**Roman - Xelek ( 9 û Dawî ) ©**


**Pîr RUSTEM**

*pir1963@gmail.com*

( 'Efrîn - Sûriya )




- Helal û heramî, olên kevin di evê yekê de pir tişt ne gotine û tiştên ku gotine jî, bê vacin; weke rêdana ku, yek bi dê an jî xûşka xwe re bizewce. Lê olên asûmanî, her tişt ji hev bi derxistî û ji yekî re xûyakirî, dê çawa xwe ji guneha bi parêze û çi yê te ye û çi li ser te ye... Hemû tişt ji yekî re aşkere kirî. Di vir de Koçer berkenî dibe û mîna ku, ew li benda evê pirsê mabû û ew di cih de çîkekê davêje navbera Agob û Kalemêr.

- Ne xeme, bes tiştin li ba we helalin û Îslam jî wam heram dike.

- Wek. **... Dûmahîk Rûpel: 14**

## ROJHILATÊ ALMANYAYÊ Û ÇAND ( Beşê 4 )

**W**eimar bajarekî biçûk e lê xwediya dîrokeke dewlemend û rengîn e. Johann Wolfgang von Goethe 50 salan li vir maye. Xaniyê wî îroj bûye şûneke serilêdana gerokan. Pirtûkxaneya wî, hinek ji tiştên ku wî bi kar dihanîn, textê wî, şûna zarokên malbatê û heta bi erebeya wî be hîn mane. Heykelê wî û Friedrich Schiller'ê ku her weha demekê li vir cîhwar bûye li navenda bajêr e û navên wan bi hev re li her derê ne. Li baxçeyên wê yên bedew,- **... Dûmahîk Rûpel: 10**





**Şahînê Bekirê Soreklî**

*shahinsorekli@hotmail.com*

( Sydney - Australiya )


## BINGEHÊ HOZA BERAZÎYAN

**B**ingeh û binhatina hoza Berazîyan, çiqasa sale kevine û ji kuva heta roja îro dikişê û têye. Çima Berazîyan hîn bi çand û zimanê xwe yî kurdî deng dikin û diaxifin? Li Kurdistanê hema, her kes dibêjê û dizanin ku hoza Berazîyan bi çand û zimanê xwe yî Kurdî deng dikin û diaxifin. Sedema ku hîn bi zimanê xwe deng dikin û di axifin çêye? Berazîyan ji hezar salan da heta bi 330-280 salî ji berî îro tevayî xwe Kurdên Ezdayî bûne! Kurdên ku Ezdayî mayîn jî, tevayî hîn bi zimanê xwe, zarevayî Kurmancî paqij- **... Dûmahîk Rûpel: 6**




**Feqîr Ehmed**

*feqir1@googlemail.com*


( Almanya )


## SPASÎNAMYEK


**Ehmedê Huseynî**

*ehmedehuseyni@live.co.uk*

( London - Ingiltera )





**B**i navê xwe, bi navê xwişk û birayên xwe û bi navê binemala Huseyniyan, çi li derve û çi li hundirê welêt, ez ji dil û can partiyên Kurd, perlementerên Kurd, sazî û dezgehên civakî û çandî, dost û hevalan, rewşenbîr û hunermendan û revenda kurd a li ewropayê û hemî kesên ku beşdarî şûn û sersaxî û oxirkirina dawîn a birayê min Ebdulrehman bûn, çi yên ku bi xwe amade bûn, çi yên bi telefonan û peyman û çi jî yên ku di Fêsbûkê de hestên xwe derbirîn, bi hestine rasteqîn û dilsojane spas dikim. **... Dûmahîk Rûpel: 13**

## HOZANVAN Û PÊDAKIINA FANTAZIYÊ

**Sigmund Freud (1856-1939)**

**Z**anayê navdar Sigmund Freud dibêje, ku di her mirovekî de hozanvanek heye, û hozanvanê dawiyê bi mirina mirovê dawiyê re diçe. Ew dipirse, ma wê ne çêtir be, em li rêç û şopa hozanvanê pêşîn li ba zarok bigerin? ji ber ku zarok bêtir ji lîskê hezdike û xwe bi lîskê re gêro û mijûl dike. Ew ji xwe re, wek hozanvan cîhanekê avadike, an em rast- **... Dûmahîk Rûpel: 12**




**Can Kurd**

*cankurd@hotmail.com*

( Bonn - Almanya )


## BERIYA MÊRDÎNÊ Û QAÇAXÎ

**- 28 -**

**D**ema nivîsandina vê gotarê min bi pirranî hêviyên xwe berdan ser bîra xwe a zaroktiyê, serwextiya xwe a niha û bîra hinek kalemêrên ku di nav bûyerên qaçaxê de bûn. Û bi wê zanebûna xwe a ezber û wek (şahidê) dîdevanê demekê a dîroka me Kurdên Binxetê, min beşek ji rastiya têkilî û pêwendiyên qedexe û qaçaxiya bi xwîn a ku di nabera xelkên me yên Serxet û Binxetê de dibû daniye ber çavan û ji xwendevanên zimanê Kurdî re pêşkêşî dikim. **... Dûmahîk Rûpel: 4**





**Konê Reş**

*koneresh@hotmail.com*

( Qamişlo - Sûriya )

# Dr. NÛREDÎN ZAZA



**1919 - 1988z**

**D**r. Nûredîn Zaza serokê yekem partiya kurd li Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê, di sala 1919an de li Paloyê li nêzîkî Ameda Bakurê Kurdistanê ji dayik bûye, û ji ber ku malbata wî di sala 1925an de tevlî şoreşa Şêx Seîd Pîran li Bakurê Kurdistanê bibû, bavê wî Yûsif û birayê wî Dr. Nafiz ji aliyê hikûmeta Turkiyê ve hatibûn girtin, û piştî ku ew serbest hatibûn berdan, Dr. Nûredîn Zaza ku wê demê temenê wî 7 sal bûn, li gel birayê xwe Dr. Nafiz hatibûn Rojavayê Kurdistanê û li bajarê Qamişlo bicih bibûn.

Dr. Nûredîn Zaza xwendina xwe ya destpêkîn heya bekaloriya li Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê xwendibû, û di pişt re berê xwe dabû welatê Iraqê û li Bexdadê di sala 1944an de demekê hatibû girtin, piştî serbestberdana wî li Iraqê, wî di sala 1945an de berê xwe dabû welatê Lubnanê û li Beyrûtê xwendina xwe ya bilind di beşê Zanistên Siyasî de li zanîngeha Frensî bidawî kiribû, û di pişt re, Dr. Nûredîn Zaza di sala 1949an de berê xwe dabû welatê Siwîsera, û li wir xwendina xwe ya Diktora di Felsefe û Zanista Civakî de li zanîngeha Lozanê qedandibû, û bawernameya Diktora di sala 1956an de bidest xistibû, herweha di dema xwendina xwe de li Ewropa, Dr. Nûredîn Zaza Komeleya Xwendevanên Kurd li Ewropa di sala 1949an de ava kiribû, û li gel hin hevalên xwe, Kovara Dengê Kurdistan derxistibû.

Piştî ku Dr. Nûredîn Zaza vegeriyabû Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê, û li gel mamustayetiya xwe ya li Zanîngeha Şamê di warê Felsefê û perwerdeyê de, wî piştgiriya damezrandina yekem partiya kurd bi navê Partiya Demoqrat Kurdistan Sûriya kiribû.

Dr. Nûredîn Zaza di tomareke xwe ye dengî de dibêje, ku di dema damezrandina yekem Partiya Kurd de li Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê, hikûmeta Sûriyê ew tuhmetbar dikirin ku ew dixwazin Sûriyê perçe bikin û dewleteke kurdî ava bikin.

Dr. Nûredîn Zaza dibêje, ku piştî dadgehkirina wan, hikûmeta Sûriyê têgihişt ku wan tenê partiyeke kurdî ava kirine, û daxwaza wan ne perçekirina welatê Sûriyê ye, û wan tenê dixwest miletê xwe hişyar bikin, û ji bo azadiya Kurdistanê bixebitin.

Dr. Nûredîn Zaza di sala 1960î de li gel hin hevalên xwe ji aliyê hikûmeta Komara Erebî ya Hevgirtî ve, ya di navbera Sûriyê û Misrê de hatibûn girtin, û ji ber xebata xwe siyasî ew demekê ji bo parêzgeha Siwêdai li Sûriyê hatibû sirgûnkirin.

Dr. Nûredîn Zaza di berevaniya xwe de li hember dadwerê Dadgeha Ewlekariya Dewleta Sûriyê gotibû: ((divê ku win rastiya hebûna miletê kurd li ser axa xwe li Bakurê Komara Erebî ya Yekbûyî bizanibin, ku ji mêj ve ta niha bi biraderên xwe yên Ereb re dijî, û ew miletekî xwedî ziman û filiklor û dîrokeke taybete, û girêdana wî bi van tiştan de, nebûye cihê jihevçûn û nexweşiyê di navbera kurd û Ereban de)).

Di sala 1962an de, Dr. Nûredîn Zaza wekî nûner ji ber partiya xwe ve, tevlî hilbijartinên parlemantoya Sûriyê bibû, lê ji ber nîr û mercên wê dem û qonaxê, ew di hilbijartinên parlemantoya Sûriyê de biser neketibû, û di pişt re di sala 1963an de ew ji partiya xwe dûrketibû, ew jî bibû sedem ku Dr. Nûredîn Zaza di sala 1966an biçe Libnanê û li wir jî demekê hatibû girtin, û di sala 1967an de ji Libnanê û Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê derketibû û berê xwe dabû Turkiyê û Bakurê Kurdistanê, û di pişt re di sala 1970î de careke din çûbû Siwîsera û li wir jiyana xwe berdewam kiribû.

Kar û xebata Dr. Nûredîn Zaza ne tenê di warê siyasî de bû, wî di warê rewşenbîrî de jî kar dikir û xwedî gelek berhem bû, gelek nivîs û çîrokên wî di Kovara Hawarê ya Mîr Celadet Bedirxan de hatine weşandin, û hin pirtûkên wî jî hatine weşandin, û ji wan jî: Şerê Azadî, Memê Alan, Keskesor pirtûka kurteçîrokan ji aliyê weşanxaneya Nûdemê ve hatibû weşandin, û pirtûkek jî bi navê Bangek ji bo Miletê Kurd di sala 1982an de belav kiribû, û pirtûka Şivanê Kurd ya Erebê Şemo jî wergerandiye, herweha hin nivîsên wî jî hîn nehatine weşandin.

Dr. Nûredîn Zaza ji keçeke Siwêserî zewicî bû, û lawekî wî bi navê Şengo heye.

Di roja 7ê Cotmeha sala 1988an, Dr. Nûredîn Zaza di temenê xwe yê 69 salî de li welatê Siwîsera jiyana xwe ji dest dabû, û li goristaneke bajarê Lozanê hatibû binax kirin.

# NÊRÎNÊN TE




**Sîpanî**
*sipani65@hotmail.com*
( Wan - Turkiya )

**E**z winda dibim
Di nêrnê teda
Dikevim nav xewn û xeyala
Diçime pişta çiyayê qaf
Bi per û bazikê teyrê enqa
Berav dikim nêrînên te
Bo neêşên nêrîn
Nêrînên biyanê
Çevê xwe bigrin
jibo Xwedê


Li kune nêrîn ên te ?
Kuda herin bila herin
Bikevne binê behran
Ezê mina xoznebehran
Xoruşê bin î bibim
Bikevme binê
Gol û behr û darya
Bi toran berav bikim
Ê dî yê min in
Şikir ji Xwedêra

Nêrînên te ez
Kirme girtîyek ji girtîyê
Girtîeha Sinip û Zonluldaxé
Ez gitîme
Gardîyano
Ma tu dikarî
Nêrînan zincirkî
Gerdun ji rojê
Biqete jî
Bila nêrinên te
Ji çevên min
Neqetin

Di nêrînê te da
Baxçên gula
Baxê Îrem
Gerdun
Û kainat neqiş kiriye
Neqaşê ezel
Ez feqîrê
Rehma Xwedê
Û nêrînê te me
Sedeqekî ?

**06.03.07**

## DORPÊÇKIRIN



**Mihemed El-Maxût**
**Wergerandin ji 'Erebî:**
**Fadil Temo**

**H**êsirên min şîn in
Ji pirahiya ku min
Li ezmên nihêrî û ez giryam
Hêsirên min zer in
Ji dirêjahiya ku min
Sinbilên zêrîn
Di xewnan dîtin
Û ez giryam
Bila serok herin şeran
Û evîndar herin daristanan
Û zanyar herin taqîgehan
Hema ez
Dê li tizbî û kursiyeke kevn bigerim
…
Da ku vegerim
Weku ez berê
Dergevanekî kevn
Li ber deriyê xemê
Mafir hemû pirtûk û
Derstûr û ol
Teqez didin ku ez
Namirim
Ji pêvî
Birçî
Yan
Girtî

## HELBESTVAN

## MELLE HISÊNÊ BIZGÛRÎ

## ( SEYDAYÊ KELEŞ )

**1930 - 2007z**

**H**elbestvanê Kurd Seydayê Keleş ku navê wî yê rastîn, Melle Hisênê Bizgûrî ye, di sala 1930î de li gundê Bizgûrê, yê ser bi parêzgeha Mêrdîna Bakurê Kurdistanê ve ji dayik bûye, û di zaroktiya xwe de, dema ku temenê wî 6-7 sal bûne, ew sêwî mabû, û bê bav û dayik koçberî Rojavayê Kurdistanê bibû.

Seydayê Keleş li Rojavayê Kurdistanê dest bi xwendinê kiribû, û di derdora salên 1950î yên sedsala borî de, helbestvanên kurd Cegerxwîn, Mela Ehmedê Namî û Tîrêj nas kiribûn, û wî jî dest bi nivîsandina helbestan kiribû.

Seydayê Keleş, zarokên kurd fêrî zimanê kurdî dikirin, û li gelek gund û bajarên Rojavayê Kurdistanê, korsên fêrkirina zimanê Kurdî ji Kurdan re vedikirin, û piştgiriya komîte û saziyên fêrkirina Zimanê Kurdî û çandî dikir.

Di ber nivîsandina helbestê re, helbestvanê kurd Sydayê Keleş, di jiyana xwe de gelek karên bi cefa kiribûn, ji bo ku debara jiyana xwe û zarokên xw bike, herweha karê siyasî jî di nava tevgera siyasî ya kurd de, li Rojavayê Kurdistanê kiribû, û peywendiyên wî, wekî kesayetiyeke niştiman perwer, bi piraniya partî û dezgehên rewşenbîrî re baş bûn.



Seydayê Keleş di jiyana xwe de gelek berhem di navbera salên 1981 û 2007an de afirandine, ji wan jî, dîwanên wî: 1- Em û Dijmin 2- Rêka Gel 3- Derdê Millet 4- Ronahî 5- Xebat 6- Helebçe 7- Gotinên Bav û Kalan, û şêwe û cureyên helbestên wî, bêhtir helbesta kilasîk ya bi wezin û qafiye bûn.

Herweha Seydayê Keleş xwedî hastên neteweyî bû, û gelek helbest li ser zor û zehmetiyên ku miletê kurd li Kurdistanê dîtine, nivêsandine, û 2 dîwan û bîranînên wî yên destnivîs jî hene, ew jî evin: 1- Berbang 2- Baxistan 3- Bîranînên Min in, û gelek helbestên Seydayê Keleş bûne stran jî, wek helbesta Miştaqê Te Me, û Gerdena Nazik.

Ji ber ked û xebata wî ya di ber helbest û zimanê Kurdî de, herweha ji ber peywendî û karê wî yê siyasî,

Seydayê Keleş gelek caran ji aliyê hêzên ewlekariya Sûriyê ve hatiye lêpirsîn, girtin û êşkence kirin, û cara herî dawiyê jî di sala 2002an de bû, ku mehekê li Qamişlo hatibû girtin.

Seydayê Keleş di temenê xwe yê 77 salîn de, di 18ê Hizêrana sala 2007an de, li bajarê Qamişlo koça dawîn kiribû, û li goristana Qudûrbegê ya navdar li Qamişlo hatibû binaxkirin.

**BERIYA MÊRDÎNÊ Û QAÇAXÎ - 28 - ... Dûmahîk:**

Di zaroktiyê de, bi bîrbûn û naskirina derdora xwe re, ji min re hat diyar kirin ku gundê min Doda li ser sînor e, sînor bi mayîn û têldiryanan pêçayî ye, qedexeye ku em nêzîkî sînor û herdû şivên hesin bibin.. Mezinan ji me re digotin; nêzîkî sînor û xeta hesin nebin, wê cendirmeyên tirka fîşekan berdin we, we bikujin û wê mayîn bi we de biteqin..

Erê di wê bîreweriya biçûkanî de, min tirên nas kir, ew tirêna ku xeta wê di serê erdê me re derbas dibû. Hingê mezinan em ditirsandin û ji me re digotin; Dûrî tirênê kevin.. Dema tirên bê, xwe bidin paş, bayê wê mirov bi alî xwe de dikşîne û mirov di nav badokên lingê xwe de diperçiqîne.. Ew tirên ji kû dihat, diçû kû me nizanîbû.. Di wê zaroktiyê de, çendî min dixwest, ez jî rojekê li wê tirênê siwar bim û wek rêwiyên wê li dinyayê bigerim û bibînim.. Car cara bi dizî, di hundirê besta Zorava re an besta Zixur re, min xwe digihand bin pira Zorava an Çûva, di ber û hesinê pirê de diponijîm û min ji xwe re digot; kê, kengî û çilo û çawa ev pira ha hatiye çêkirine.. Çima ev sînorê bi mayîn di nav me û mirovên me yên Serxetê de hatiye danîn û em nikarin herin bal wan, ne ew karin bêne rex me..? Qet min nizanîbû ku ew pir Elmanan di sala 1917 an de çêkiriye û ew xeta tirênê, Berlîn bi Bexdayê ve girêdide..

Di wî heyamî de jî, hin caran ji xew şiyar dibûm, min didît ku hewşa me tijî pez û dewarin û ode ji mêvanan dagirtiye ji xelkên xerîb.. min ji diya xwe dipirsî ev kîne? Li min vedigerand û digot; Huş e, te çi ji waye, mêvanin.. Hingî min nas dikir ku Serxetî ne.. Gelek caran wan mêvanan Mewîj, bastêq, helîl û nokên daxlî ji me re tanîn.. Di wan rojên mêvanan de, ez û birayê xwe di nav kar û barên malê de diwestiyan.. Gelek şevan jî xew li me diherimî, ji ber qupîna tevingên ku ta berê sibehê dûmdikirin, nexasim ku me dengê teqîna mayînekê bibihîsta, hingê xew û tebat li bavê min nedibûn mêvan, çixare di pey çixarê re vedixwar, ta ku dibû sibe û di ber xwe de digot; gelo kî ye evê ku mayîn pêde teqya ye..? Hatiye kuştin an birîndar e..?

Ji destpêka çerxê 20 an, ta berî ku sînor bi mayîn û têldiryanan di navbera Sûriyê û Tirkiyê de bê danîn û pêçan, çûn û hatina Serxet û Binxetê hêsan bû, Xelkên Beriya Mêrdînê ji sûka bajarê Mêrdînê bêtir ji sûka bajarê Mûsilê, lazimî û alavên xwe yên malê dikirîn –Ji kevin ve Beriya Mêrdînê bi van herdu bajaran ve girêdayî bû, hingî Nisêbînê wek gundekî bû, bi tenê çend aşên avê lê mabûn- û gelek caran ji ittar û bazirganên Mêrdînê, ewên ku li Beriya Mêrdînê, gund bi gund digeriyan, lazimiyên xwe pêk tanîn.. Jixwe xelkên gundên Beriya Mêrdînê ervanên xwe dibirin aşên Mêrdînê, Darê û Nisêbînê hur dikirin.. Lê piştî mirina Ibrahîm Paşayê Millî di sala 1908 an de, peymana Saykis-Bîko di sala 1916 an de, danîna sînor û bicîkirina qereqolên leşkerî yên tirkan di seranserî sînorê sûriyê û tirkiyê de, ew pêwendiyên Serxetiyan û Binxetiyan qels û lawaz bûn; her eşîrek bû du eşîr, her malek bû du mal, yek li Serxetê û yek li Binxetê û wiha bira ji bira, xal ji xwarzê, ap ji birazê qut bûn..

Lê gelê Kurd yê ku bi vîn û iradeya xwe a ku ji kevir hişktire, bi vê plana herdu dewletan nehat kedîkirin, bi tev şêweyên berxwedanê hewilda ku pêwendiyên herdu rexên xetê ji hev qut nebin û wiha dest bi rêkên qedexe kir.. Lê sed mixabin, ji encamên wan rêkan bi hezaran ji neferên gelê Kurd bi mayîn û guleyên cendirmên tirko hatin kuştin, ji bil yên ku lingekî wî an du lingên wî hatin jêkirin..

Wek ku min got, berî ku mayîn bêne danîn, xelkên Beriya Mêrdînê, lazimiyên xwe yên malê wek cil, caw û pêlavan, alavên cotkirinê wek; halet, gîsin, das, kurtan, melhêb, misas, hevsar, sing, tekelên ereban û alavên malê yên din wek; zembîl, mekeb, kevçiyên darî, misînên sifir, hesik û firaxên xwarinê yên têvel.. hem jî beşt, mircaq, komir û mewîj, bastêq, nokên daxlî, hejîr, helîl û.. ji ittar û bazirganên Mêrdînê dikirîn, ew Ittarên ku ev malê xwe bi rêkên qedexe û bertîlkirina leşkerên tirkan yên ku zêrevaniya sînor dikirin, derbasî bazara (sûka) Amûdê û Qamişlo dikirin û difrotin xelkê.. Lê bi danîna mayînan re, rê ji ber derbasbûna van lazimiyên rojane yên xelkên Beriya Mêrdînê hat birîn.. Û bi demê re ew rêkên çûn û hatinê bûn qedexe û wiha qaçaxiyê destpêkir..

Qaçax çiye? Qaçax ew malê ku li sûriyê heye, li tirkiyê nîne û bi dizî derbasî tirkiyê dibe û vajî vê yekê, anku ew malê ku ne bi rengekî fermî ji dewletekê derbasî dewleteke din dibe. Qaçaxçî ew mirovên ku wî malî bi dizî, bê destûra dewletê derbasî dewleteke din dikin. Rêber; ew kesên ku rê şanî qaçaxçiyan dikin..

Bi danîna mayînan re qaçaxê di Doda re jî destpêkir û qaçaxçî û rêberên qaçaxçiyan çêbûn.

Qaçaxiya ku di gundê min Doda re dibû, mîna qaçaxiya tavayî gundên Beriya Mêrdînê yên di ber sînor re bû. Ew mayînên ku di sala 1958 an de li seranserî sînor hatibûn çandin û guleyên cendirmên tirkan yên kujek, nikarîbûn hêza pêwendî û berdewamiya têkliyên Serxetiyan û Binxetyan qut bikin û bimrînin, nikarîbûn xal ji xwarzê, ap ji birazî bidûr bixînin.. Vêca çûn û hatina qedexe destpêkir, bi wê çûn û hatinê re jî qaçaxiyê serê xwe hilda..

Doda gundekî ava û sînorî ye, di navbera du bestan û du pirên ku tirên di ser wan re derbas dibe hatiye ava kirin. Di wî hayamî de Doda navenda van gundên derdora xwe bû; Xerabkortê, Gundik û Tilkêfê.. Qereqola wê di sala 1948 an de hatibûn ava kirin, piraniya xelkên van her çar gundên Binxetî û xelkên van gundên Serxetê yên himberî wan; Qesra (Qesra Serçixan), Çûva, Menderê, Zorava, Sirêçkê, Sarincê mirov û xizm û karên hev bûn.. Erê ta berî danîna mayînan pêwendî, çûn û hatina xelkên van gundan ji herdu rexên xetê ve hêsan bû, lê bi danîna mayînan re ew derfeta têkilî û pêwendiyan ji ber wan hat birîn. **... Dûmahîk Rûpel: 5**

**BERIYA MÊRDÎNÊ Û QAÇAXÎ - 28 - ... Dûmahîk:**

Vêca ji neçarî berê xwe dan hevdîtin û pêwendiyên qedexe û wiha çûn û hatina di nav mayînan re, bi bertîlkirina cendirmên sînor destpêkir.

Destpêka çûn û hatina qedexe û qaçaxî ji gundê Qesra(Serçixan), yê Serxetê û gundê Gundik û Tilkêfê yên Binxetê destpêkir.. Nexasim ku xelkên van her sê gundan bira û pismamên hev bûn, hem jî ku Qesra li ser herdu şivên hesin bû, rewistgeha tirênê (Stasiyon) lê hebû û mayîn lê nebûn, bi tenê têldiryan hebûn û bi sînorê Binxetê ve bû.. Ji ber çûn û hatin di nav erdên Tikêfyan û Gundikyan re bû, wana rêberiya qaçaxçiyan li Binxetê dikirin û ne dihiştin kesî din bike.

Ji rêberên Tilkêfê; Mihemedê Elîka, Salihê Izzet û hin mirovên wan yên din hebûn û ji rêberên Gundikê Ehmê; Brehîmê Çelebî, Ismaîlê Çelebî, û Selîmê Şekir ji Gundikê Şekir bû. Van kesan, bi razîbûna leşkerên Qereqola Doda, xelk derbasî vî aliyê xetê û wî alî dikrin, rêberên Qesriyan jî ku mirovên wan bûn, wan jî cendirmeyên xwe bi pera razî dikirin û xelk derbas dikirin.. Dodayî jî çav li wan ketin, dîtin ku karê rêberiya qaçaxçiyan ji karê danheva keviran ku ew ko kiribûn hesantir û bi sûdetire, vêca wan çend malên melakên gund xwe dan hev û destê xwe danîn ser rêka qaçaxê a besta Zixur, ewa ku Seyid Şerîf û Şêxmûsê Ibrahîmê Ehmedko ji gundê Xerabkortê bi xelkên gundê Çûva yê Serxetê re dikirin.

Û wiha rêka qaçaxê ji destê Xerabkortiyan ket destê Dodayan de, bi têkilî, bi mirovên wan yên li gundê Çûva (Serxetê) û razîbûna leşkerên qereqola Doda.. Û van kesan rêberiya qaçaxê di nav Doda û Çûva de dikirin; Evdilhemîdê Melek, Silo Gilot, Hisênê Aliya, Hisênê Mencê, Şikrî Ezîz, Cemîlê Gedo û Xelîlê Hecî..

Mafê derbasbûna siwarî tevî bar 50 L. S, Nefer 20 L. S, Dewar 10 L. S û pez 5 L. S bû.

Kî bûn yên ku diçûn û dihatin? Mirov dikare wan li sê beşan par veke; yek jê xelkên wan gundên Serxetê û Binxetê bûn, ewên ku gundên wan bi ber sînor ve bûn û mirovên hev bûn; anku xwih û bira bûn, ap û birazî bûn, xal û xwarzê bûn, ji bo têkilî û hevdîtinê diçûn û dihatin gel hev. Yê din ew kesên ku di werzê havînan, werzê çinîna dexlan de ji çiyayê Omeriyan an ji Tora Mihelmiyan dihatin li Beriya Mêrdînê peleyî dikirin û dizîvirîn gundên xwe..û beşek ji wan, bo kar û xebatê di sûriyê re derbasî Beyrûtê dibûn.. Beşê din hebû, erê navê wan bi qaçaxçiyê derketibû, lê ew bixwe rêber bûn, rêberiya qaçaxçiyên mezin dikirin, mayîn radikirin û ew derbasî vê alî û wî aliyê xetê dikirin.

Mebesta min jê, rêberên wan siwariyên ku ji Xurs û Licê tûtin û malê qaçax tanîn û di gundê Qibûrelfazil, yê Silêmanê Botî re dibirin ta bi çiyayê Şingalê.. Mirov nikare di ser navê wan re derbas bibe, li bareşî Qamişlo ev kesanan bi qaçaxiya xwe navdar bûn: Muradê Sêvê (Di sala 1976 an de bi mayînekê li sînorê Amûdê hat kuştin), Fewziyo, Omerê Şernexî, Selîm, Çibîro, Aydîn, Ishano..

Li Hilêliyê Izzeddînê Mihemed Seîdkê, Salim, Mihemed Emînê Batûşî.. Li Amûdê Ebdilwehabê Reşwanî, Cemîlê Hemenê, Ibrahîmê Bilalo, Xelîlê Qorê, Şêxê Eyşokê, Sebriyê Elo, Bêrtî, Reşîdo, Ferecê Şêxo Koro..

Di salên 1961/2/3/ de, rola qaçaxa ku di gundên ber sînor re dibû qube û mezin bû, leşkerên sûriyê û cendirmên tirkiyê bertîl dixwarin û yê bihata kuştin û birîndarkirin an girtin û zindankirin ji kîs xwe diçû.. û di encam de gelek zarok sêwî diman, lingê gelek zilaman jêdibû û derîkê gelekan dihat girtin..

Di eynî wan salan de, şoreşa Barzaniyê nemir li başûrî welat li dar bû, 49 rewşenbîrên Kurd li Bakurî welat di zindanê debûn û li rojava piraniya endamên Partî di gel Dr. Nûreddîn Zaza û apo Osman Sebrî di zindanê debûn, vêca ji tirsa ku Kurd bi raperînek mezin di Kurdistanê de rabin, hikumeta tirkiyê neçar bû ku bêhinvedanekê bide Kurdan û kela dilê wan hinekî sar bike, ew bêhinvedan navê wê (Gorişme) bû, anku hevdîtina Serxetiyan û Binxetiyan, a li ser sînor bû.

Ew hevdîtin (Gorişme) di rojên cejnan de li gundê Qesra: (Serçixan), di rewistgeha (Stasiyon) wê de pêk dihat. Evara cejnê mala me tijî mêvan dibû, ji bajarê Hesekê û gundên beriya Mêrdînê dihatin, da ku sibeha cejnê karibin çav bi mirovên xwe yên Serxetê kevin.

Dema ku li stasiyona Qesra Serçixan dibû  Gorişme, dengê xelkên vî alî têlê û wî alî têlê digha esmana; bang hev dikirin, bi hev re dikeniyan û hin bi hev diaxifîn û digiriyan.. Wê Gorişmê çend salekî dirêj kir û betal bû..

Hêjaye gotinê, ku di eynê wan salan de hin kesên welatparêz hebûn, bi emrê Partiya Demokratî Kurdî li Sûriyê mayîn radikirin an ji qaçaxçiyên ku mayîn radikirin didan hev û ji şoreşa Barzaniyê menir dibirin wek; Oskê Zaxuranî, Letîfê Şêkir ji gundê Letîfiyê, Reşê ji gundê Sêgirka, Mehmûdê Hesenka ji gundê Dêrûna Qulinga, Ehmedê Sîno ji gundê Babasiyê..

Û Hisênê Ehmê ji gundê Qesra Serçixan a Bûbilana, ta ku vê paşiyê ev mirov bi lêdana cendirmên tirkan hat kuştin.. û Tewfîqê Cizîrî û Sebriyê Eliyê Ehmed.. Di gel re jî nameyên Partiya Sûriyê ji Partiya Iraqê re dibirin û didan destê Issa Siwar, Esed Xoşewî û Mirhac..

Ma nêhêjaye ku mirov wek van kesan bibîr bîne.. Hem jî hêjaye ku em bêjin; di wan salan de gelek ji Cihûyên Qamişlo di rêka qaçaxçiyan re derbasî tirkiyê bûn..

Dawî dibêjim; tevî kuştin, lingjêkirin, girtin û êşkencê, hêza berxwedana hebûn û berdewamiya têkilî û pêwendiyên Serxetyan û Binxetyan ji hêza mayîn û gulleyên tirkan mezintir bû. Ez jî bi vê hevoka ku li ser gora apê Mûsa Anter hatiye nivîsandin: Zulim ne qedere.

**Qamişlo, 22.08.2011**

**BINGEHÊ HOZA BERAZÎYAN ... Dûmahîk:**



-dizanin û diaxifin. Mînakê ji xwandewanên xwe hêja ra bidim> Şengal li başûrî Kurdistanê ye û şeşsed k m ji hoza Berazîyan dûrtire. Ji bo ko Şengal jî tevayî xwe Ezdayî mane, Zaravayê xwe yî Kurmancî paqij diaxifin û dizanin! Yeke dîn jî, Kurdên ko li Êrmenîstanê dimînin, tevayî xwe Ezdayîne û zaravayê xweyî Kurmancî pirr xwaşik diaxifin! Ji Kurdên ko li Êrmenîstan`ê jîn dibin, bi sedan nivîskar, helbestvan, ronakbîr, pispor, wênevan, şanoger, şanovan, hozan û kesayetên Kurdên herî bilind jê derketine holêye! Ji ber vê sedemê hoza Berazîyan zimanê xwe yî Kurdî ji bîr nekirine. Ji bo ku Ola Zerdeşdî metih û wezinê xwuda tevayî bi zimanê Kurdî di nav Zenda-Avitan da danyîê û nivîsandine.

Rêhberê Kurd Zerdeşd, tu karê xweyî bi ne bawerîyê tunene. Ji berî her netewê, Rêhberê Kurd Zerdeşd xwuda dayê naskirine û bi vî şeklî dibêjê: Xwudayê roj û şevê tu tuştên pîs bi ser me da neyînî û tuştên rind bidî me netewa Kurd! Di alîyên duem da jî, di nav hoza Berazîyan da, tu netewan dîn tunene. Ji bo vê yekê jî, hoza Berazîyan bi serê xwe mane û bi zimane xwe deng kirine. Vaya jî pirr tuştekî herî pêwîste! Mînake dîn jî heye, bi vî şeklî dibêjin. Ji hozên Berazîyan pirr çîrokvan, metelokvan, dengbêj û hozan hatine dere. Vana ji çanda Kurdistanê kevinar li civînan mêrxanan (odan) ji gelê xwe re digotin û bi gelê xwe didan zana.

Gel jî, ji wa hozanan û çîrokvanan ziman û çanda xwe guh didane ser û ho dibûn! Va çîrokvanan hêja û bi rûmet, bi rest û durist, ku dema dest bi çîrokanên xwe dikirin, wekî fîlimên sîneman dihanîn pêş çavên gel û mêjîyê gel fere dikirin! Ji gel re bi şevan û rojan mesele û metelok dihanîn pêş çavan. Hoza Berazîyan bi van sedeman hîn ziman û çanda xwe Kurdî dizanin û diparêzin. Min dît ku mîrov bi wêje û dîroka xwe nizanibê, nikanê tu caren duxwaz û doza xwe yê welatxwazî bibînê, binivisînê û ser rest bikê.

Tu caren bi nezanî ne şoreş bûne, û nejî tu welat rizgar bûne. Bê zanebûn jî, hîn tu kesan çanda xwe ser rest nekirine. Ser rast kirin bê zanebûn nabê. Ji bo berpirsîyarî`ya doza welatê, xwe, pêwîste her mîrovên Kurd xwe zana bikê û vî barî hildê ser milên! Bi zor bê jî xwe zana kirin, di şertên welatxwazan da tê pêk anîn. Pirr sal bûn, ku mîrovên Kurdistan li ser doza welatê xwe nivîsandin û nivîs kirin. Lê tim û tim, ji bo doza welatê xwe, ne bi zanebûn, ji xerîban qopîya dikirin û hînjî dikin. Wa zanayên Kurdên hêja şert, şurût û qerektêrên gelê xwe baş nas nekiribûn!

Ji bo van tiştana jî rizgarîya welatê me tim li paş xelqan mayê û pêk nanîne. Hemû zanayên Kurd û Kurdistan, ji bo hoza xwe, yan jî ji bo keseyeta xwe, û yan jî, ji boyî navçakê serê li himberî dijminên hildane. Bi va sedeman dijminên Kurd û Kurdistan, kuştinên herî mezin bi serê gelê Kurd da anîne û hîn jî tînine! Ji bo va tiştana, ez jî duxwazim, ji berî her tiştî, çand û dîroka welatê xwe baş û pê zanibim.

Ji bo ku binim zana, ez kîme û em kîne, çend sal bûn, ku ez li ser çanda Kurd û Kurdistan xebat dikime û li ser sekinîme. Xwe çêkirina min jî, ji bo`yî ko ez kanibim alikarîya sîyasetên kurd bikim. Ji berî her tiştî, ez li ser bingeha vê hoza Berazîyan sekinîme, dixwazin derxînime ser rûpelê û binivisînim. Ez ji hoza Berazîyan, ji hêjan û ji ronekbîrên Kurdistan bûhrendin dixwazin. Dibê ku kêmasîên min hebin, ji bo vî hawayî destûr ji gelê xwe jî dixwazim. Ku kanibim vê çîroka hoza Berazîyan li ser rûpelê binivisînim. Ji berî ku dest bi nivîsa xwe bikim.

Bi navê Zerdeşd û Xwuda`yê mezinî Yêzdan û dilovan, bi navê nemirên Kurdistanê dest bi çîroka xwe dikim! Çîrokvanê mezin û hêja Midrisê Mechan dibê:" Pisporê Misrî Dawûd El Kan, di pirtûka xwe ku bi navê Şerqel ewûsed da, di sala 1423 li Qahîrê hatî çap kirin. Di wê pirtûka xwe da kok û binhatina hoza Berazîyan nivisandê û anîyê ser rûpelê. Mîrovê hêja Pisporê Misrî Dawûd Elkan dibêjê." Hoza Berazîyan 1650 sal ji berî îro kevnarîya xwe heye. Çîrokvan nemir Midrisê Mechan jî dibêjê hoza Berazîyan heta 1521 kan, ne Berazîyan bûn. Berazîyan pirr hoz bûn. Va hozana Bîreçûk, nîv Nîzip, nîvî Bereq, nîvî Oxizyêlê, Karqamîş, Kobanî, Reqa,

Dêrezor, Tilebed, nîvî Herenê, Bajarê Riha dikê hindirî xwe û Xafa hoza Berazîyan deşta Surucê ye. Vana heft hozana li ser vî erdî û warê xwe, jîyana xwe dajotin û dom dikirin. Pirr çîrokvan, pîr û kalên Berazîyan dibêjin, ko şerek di navberî berazîyan û Ereban da derdiket Efrîn û Ezazîyan jî, xwe didane pişt Berazîyan û li hemberî Ereban şer dikirin! Ji va hozana mîrovên bi nav û deng derketine û hatine cîhanê. Çîrokvanê nemir Midrisê Mechan dibêjê, Pisporê Misirî Dawûd Elkan, di pirtûka xwe da dibêjê> kesayên wekî Hekîmê Loqman jî, ji nav Berazîyan derketîye!

Hekîm di sala 1009 da li deşta Surucê, ji bavê xwe Loqma û ji dayîka xwe Noşê hatê cîhane. Hekîn heta 19 salî bûyî bi malbata xwe re li ser erdê xwe jîn dibûn. Di 19 salîya xwe da Hekîm bavê xwe Loqman windakir. Çend salan baran li alîyê herêma Berazîyan nabarê û dibê xela! Ji bo jîyana xwe dom bikin, Hekîm dayîka xwe Noşê, bireyê xwe Sîdar û xwûşka xwe Şîrnaz rekirin bi koçberî diçin çîya`yê reşîyan û cîh digrin. Li alîyê deşta Hemqê (Komirli) di navberî bajarê Antap û Adanê da jîyana xwe dajotin. Hekîm di 25 salîya xwe da, ji Bajarê Erzîn bi keça Hemedan , Minkendar re zewîce û kete cîhan.

Ji Hekîm û Minkendar lawek û du keçik çêh dibin, navê lawê Hekîm Merdon bû. Navê keçên xwe yekem jî Şêrban û navê ya duduyan jî Kezem bû. Hekîm di mabênê 30 û 40 salîya xwe da dibê Dermandarekî herî mezin û nav dide her alî cîhan`e! Hekîmê bi nav û deng, di -101- 102 yan jî 103 salî ya da cîhana xwe guhêrî û diçê ser dilovanîya xwe! Çîrokvanê nemir mîrovê hêja, Midrisê Mechan dibêjê." Berazîyan ji berî 1521 kan ne Berazîyan bûn. Vana heft hoz bûn. Dema ku di bin serokîya hesretî Muhemed da Komara îslamîyê çêkirin û pêk anîn. Di paş çêkirina Komara îslamê re pirr sal derbas bûn û bûbûn. Rojekê Serokê Komara îslamîyê Hesretî Mihemed bi mêrxan`a (meclîsa) xwe re va gotinan dibêjê." Ey mîrovên û hevalên mine hêja û delal, me tev va Komara îslamîyê bi hezar- **... Dûmahîk Rûpel: 7**

**BINGEHÊ HOZA BERAZÎYAN ... Dûmahîk:**

-şert û şirîtên bi zor çê kir û pêk anî. Va pirr sal di ser vê Komara re derbas bû û diçê. Ey hevalên hêja Komara mê Îslamîyê mezin û fere nê xewûnandine.

Pêwîste em Komara îslamîyê fere û mezin bikin. Hozên Kurdan hîn li ser Ola xwê Zerdeşdî mane û Ola xwê Zerdeşdî diparêzin. Pêwîste em va hozên Kurdan tev bi alîyê xwe xînin! Ji boyî ku em dîrega dînê îslamîyê di Rojhilatanavî da hildin jor û li cîhanê bela bikin."

Li ser gotina Serokê Komara îslamîyê Hesretî Mihemed, ku bi mêrxana xwe re gotî. Çend mehan paşva, yan jî çend sal paşva bi duxwazîya Hesretî Ömer Ibinî Xetab, bi destê ser leşkerê Komara îslamîyê Hesretî Hemze Ibinî Welîd, artêşa îslamîyê anî ser hozên (eşîr`ê)Kurdan!

Komara îslamîyê ji boyî ku Kurdan tev bikê îslam û Ereb, pirr bi hozên Kurdan re şer kirin! Hozên Kurdan jî, bê leşkerî bûn, bi hozetî şerê xwe li hinberî artêşa Komara îslamîyê dan û dom dikirin. Şer dom kirina hozên Kurdan li hinberî Komara îslamîyê, ji boyî war û Ola xwê Zerdeşdî, ji îslaman biparêzin, şerekî bê dawî didan û dikirin. Lê artêşa komara îslamîyê pirr komkujî bi ser hozên Kurdan da anîn! Artêşa Îslamîyê û Kurdên bê artêş, bi sed salan hev re şerekî bê dawî kirin!

Kurdan ji ber zorîya artêşa komara îslamîyê tu çare nedit û pirrî Kurd bi destê zorê kirin îslam! Kurdên ku nebûn Îslam û Îslamî nexwastin jî, rivîyan xwe avêtin derbend û çîya`yên ase! Di dema Hesretî Muhemed da heta bi 1521 kan, tim û tim hozên Ereban Şemer, İniz, Şawî, Gêsan û Bedewîyan êrîş dihanîn ser hozên Kurdan. Ji bo`yî ko hozên Kurdan bikin Îslamin û xûkê bi zor jê bigrin! Kurdê reben tu çare ji destê hozên Ereban nedîn û Kurd li hev civîyan û kom bûn.

Di civîna hozên Kurdan da pirr reman anîne serê xwe. Bo`yî ko xwe ji Ereba biparêzim her deh, her panzdeh hozên Kurd gîhîştin hev. Kurdan li Kurdistan şeş û heft Federasîyone Kurdan di sala 1521 kan da çêkirin û pêk anîn! Federasîyona yekem Botan, Botan çardeh hoz bû. Federasîyona duem Şengal bû (Yêzdaxan) Şengal jî şanzdeh hoz bûn. Federasîyona sisîyan Milan bûn, Mil jî sêzdeh hoz bûn û hîn jî sêzdeh hozin. Federasîyona çaren jî, li alîyê Mîrê Serhedê pêk anî.

Bi destê kelikê kor Hisên Paşa`yê Serhedî pêk hatibû. Ya pêncan federasyona Sinemilî ya şeşan jî federasîyona Berazîyan bû. Berazîyan jî heft hoza pêk hat! Li Kurdistanê çend federasîyone dîn jî hatibûn çêkirin, lê ez ji wana nebûm agahdar û pê nizanim.

Federasîyona Berazîyan bi heft hozên Kurdan çêbûyê û hatê damezrandine.

Hoza yekem 1 Dinan (Din) 2 Şedadan (Şedad) 3 Pîjan (Pîj) 4 Kêtikan (Kêtik) 5 Dîdin (Dîd) 6 Ilêdîn û a heftem 7 canbeglîyan, Şêx û çend malbaten dîn jî, bi hozekê têne hêjmartin. Dibin 7 heft hoz û bi navê Berazîyan federasîyona xwe dadmezrînin!

Van heft hozên Kurd gîhştin hev şert û şûrîtên hev pejirandin û federasîyona Berazîyan di sala 1521 kan da pêk anîn! Dema ko va heft hozan federasîyon xwe pêk anîn.

Di rojhilatanavîda bûne deng û hêzeke herî mezin! Federasîyona Berazîyan di rojhlatanavîn da wekî Împeratorekî dihate dîtin û jîyana xwe dom dikir! Berazîyan ji bo aşîtê û azadî hêza leşkerî ji dest xwe bernedan! Bi Ola xwê Zerdeşd`î, di warê xwe da, jîyaneke xweş û paqij dajotin! Di navbêrî 1650- 1850 yî da pirr Egîd ji Berazîyan derketine.Egîtên Berazîyan nêne hêjmartin, lê em çendeke bi nav û deng ji gelê xwe re bi nav bikim.

Dondî, Elê Hisê, Evdê Şêxê, Bavê Nehsê, Kurê Ebas, Kurê Qirato, Hemê Mûsikê, Kerhê Mûsikê, Saçlî Miho, Osmsn Miho, Elxerît û bi Sedan wekî va Egîdan li himberî hozên Ereban, Şawî, Şemer, Iniz, Gêsan û Bedewîyan şerekî bê dawî dane. Van Egîd`ên hêja, xûkî ji hozên Ereban distandin. Berazîyan di şerê Mil û Ereban da alîkarî bi Milan re kirine û ji ber Milan va êrîşî ereban kirine.

Di şerê Dewrêşê Evdî da, Egîdên Berazîyan tevayî çûne banga milan. Ji bo ku Dewrêşê Evdî bi xwe`yî Êzdayî bû. Mîrê Berazîyan mala Şehîn li gundê Miktelê rûdinin. Berazîyan di 1940 da çend salan Serok wezîrê mêrxana Komara Surîyê bi dest xwe xistine. Serok wezîrê dewleta Sûrîyê Hisnî Zehîm û Hisnî Berazî Komara Sûrîyê bi destê xwe xistin û Serokî ji Sûrîyê re dikirin. Lê vana jî, ji bo netewa Kurdî tuştek nekirine.

Dîsa wekî dema îro, ko çawa Kurd diçin parlementoya dijminan, ewana jî wekî Necmetîn Cehverî, Kamûran Înan, Hîkmet Çetin û bi sedan ji dijminan ra kar kirine û bûne hevparê dijminanne! Şertên netewî nezane bûn. Lê ewên berê kesayetên xwe, ji yên îro pirr çêtir bûn.

Dîsa Serokê federasîyona Berazîyan Bozanê Şehîn û birayê xweyî jê bi çûktir Mistefa (Hirço) di doza Kurdî da hatin dîtine. Mîrê Berazîyan Bozan û Hirço, Serokê hoza Şedadan, Serokê hoza Dinan Salîh Beg û Serokê hoza pîjan Hemî Mêhmûd di Xoybûn da cîh girtine û xebat kirine! Ji federasîyona Berazîyan Serokê hoza Dinan Salîh beg bi 140 siwarî çûyê alîkarîya berxwedana Dêrsimê. Ji Berazîyan pirr hostên çîrokan û metelokvan derketine.

Va çîrokvan an ji gel re bi şev û rojan çîrok wekî fîlman dihanîne pêş çavên gel û bi gel dinimandin. Dengbêj û hozanên Berazîyan jî pirr kilamên bi rûmet ji gelê xwe re, bi roj û şevan digotin û dibêjin. Hozanên wekî Mişoyê Bekebûr Berazî, Dewrêşê Evdî, Memê Alan, Binevşa Narîn, Cebelî, Mîrê Sor, Salîhê Narsî, Bêmal, Bedew, Çeleng Mistefa, Edûla Emer begê, Siwarê çêbxwîn û bi sedan wekî va kelaman, bi roj û şevan bi dengê xweyî zelal ji gelê xwe re digotin û dihanîn ber çavan. Ji va dengbêjan û hozan Mişo Bekebûr Berazî, Xidoyê Hindawê, Ibêdê Mizarê, Mihemedê Eganan, Siltanê Kor, Xazîyê Kur, Hafizê Kor, Bozanê Ehmed û Kesên wekî Baqî Xido ji federasîyona Berazîyan derketine.

Îro jî Dengbêj Miço Kendeş, Halil Binici, Reşîd Sofî, Mihemedê Kor û hîn bi dehan dengbêjên bi rûmet jê hatine dere! Lê Mişo Bekebûr Berazî di dilê hoza Berazîyan da cîhakî xwe yî teyîbetî heye! Berazîyan qet nikanin Mişo Bekebûr Berazî ji bîr bikin û tim di dilê hoza Berazîyanda yê bimînê ye.

**... Dûmahîk Rûpel: 8**

**BINGEHÊ HOZA BERAZÎYAN ... Dûmahîk:**



Dengbêjê nemir Mişo Bekebûr Berazî rûmet û giran biha ya xwe di nav Berazîyanda pirr û pirre! Îro jî sîyasetvan, nivîskar, lêkolînvan, romanvan, çîrokvan û hozan jê hatine dere.

Kesên wekî lêgervan Halîl Akkûş, Eyşe Gokkan, Şehînê Siwêregî, Dilbixwîn Dara, Halîl Bozan, Feqîr Ehmed, Salîh Kobanî, Salîh Cefer, Polat Can, Evîn Surûcî, Îbrahîm Binîcî, Dr. Bozan Erdem, Jan Dost û kesayetên wekî Mûrad Qereîlan jî, ji nav hoza Berazîyan hatine dere! Hîn bi dehan ji Berazîyan rewşenbîr derketine. Berazîyan tevayî xwe bi Ola Ezdayî bûn.

Lê pirrî xwe di sala 1650, 1780 yî da bûne Misilman! Li gorî ku bûne Misilman hîn jî şertên Ola Ezdayî diparêzin û ji bîra xwe dernaxînin.

Ji federesîyona Berazîyan 20, 30 gund di sala 1780 û 1810 da çûne Ermenîstanê, disa 100 gundî xwe çûne alîyê Ezazê û Hema yê cîh girtine.

Hin ji berî 1550 yî heta bi 1630 qasî 50 gundî Berazîyan çûne alîyê Libnanê li Beka yê bi cîh bûne.

Hêjmarên federasyona Berazîyan natine hilbijartine. Lê 1800 da hatin hêjmarê. Hejmarên xwe tesbît kirine.

Ji federasîyona Berazîyan hoza yekam Dinan (Din) 70 gundin, 92 hezar male, hêjmarên (Din) 120 hezare, Begê Dinan (Din) mala ûsib Begê li gundê Elîgor rûdinin.

Hoza duem Şedadan (Şedad) 74 gundin, 93 hezar male, hêjmarên Şedad 121 hezare, begê Şedadan mala Gogê ye li gundê Gokan rûdunin.

Hoza sêem Pîjan (Pîj) 73 gundin, 86 hezar male, hêjmarên Pîjan (Pîj) 109 hezare, Begê Pîjan (Pîj) mala Hemê Mêhmûd li gundê Qûmlixê rûdinin.

Begê Pîjanî duem jî mala Elî hisê li Gundê Kanîye rûdinin.

Hoza çaren Kêtikin (Kêtik) 55 gundin, 62 hezar male, hêjmarên Kêtik 72 hezare, Begê Kêtkan mala Mûsikê li gundê Mezrê rûdinin.

Hoza pêncem Dîdan (Dîd) 34 gundin, 49 hezar male, hêjmarên Dîd 58 hezare, Axayê Dîdan mala Remî Xelê ye li gundê Mizgewlî rûdinin.

Şêx, 19 gundun, Canbeglîyan û pirr malbat li deşta Berazîyan hene, vana jî 14 gund in. Serokê malmezina Şêxan mala Şêxnebîyê li gundê Zîyaretê rûdinin! Şêx 19 gûn û malbatên dîn jî 14 gund, dibê 33 gundan va çend malbatan jî, bi hozekê têne hêjmartin!

Hoza heftan jî Ilêdîn, Mehef 15, Mîrekan 7 û Kuribegî 26 gundin.

Vana her çar jî bi hozekê tên hêjmartin tevî xwe dibin Aladîn (Iladîn) tevayî xwe 48 gundin, 56 hezar male, hêjmarî Aladîn 72 hezare, mîrê vana mala Şehîn Begê li gundê Miktelê rûdinin.

Ji va heft hozên Kurdan di sala 1521 kan da gîhştin hev û bûne federasyon.

Navê federasyona xwe lê kirin Berazîyan. Ji berî xwe razî nav li xwe kirin û bûn Berazîyan!

Ji hoza Aladîn mala Şehîn beg hilbijartin û kirin Serokê federasyona Berazîyan. Va heft hozên Kurdan federasyona xwe di sala 1521 kan da pêk anîn. Berazîyan di sala 1800 da hêjmarê xwe di ser 1 mîlyon re hatê gotine.

Ne federasyona Berazîyan, ne jî federasyona yêzdxwanê bi dijminan re hevparî nekirine.

Ji bo ku vana herdu jî Êzdayî bûn. Alaya hemîdî nepejarendin.

Berazîyan cîh û warê xweyî ku têda jîn dibin bi vî hawayî tê hêjmartin. Bakurî Berazîyan hoza Bêskan (Bêsk). Bakur û rojhilatî Berazîyan jî, di ber bajarê Riha re derbas dibê heta Akçqelê diçe.

Rojhilatî Berazîyan deşta Herenêye. Rojhilat û beşûrî xwe jî heta bajarê Reqê dirêj dibê û diçê.

Başûrî Berazîyan jî, ji Kubanê da 50-60 km dirêj dibê û dikişê. Bahşûr û rojavayî xwe dikişê heta çemê Ferat.

Rojava û bahşûr xwe jî heta deşta Oxuzyêlê dirêj dibêe û diçe. Rojava û bahkûr jî di ser bajarê Bîreçûk re derbas dibê digihê bajarê Xalfetî yê.

Berazîyan ji çemê Feret da bigre heta bi Entabê tevayî xwe Berazîyanin.

Lê dema Iro bi xwe re Bereq dibêjin. Bereq jî kok û bin hatina xwe ji hozên Berazîyan çê bûne û Bereqîyan jî Kurdin.

Li alî Herenê jî hoza Elûşan heye, va hoza Elûşan kokên xwe Kurdin û Berazîyan`nin.

Elûşan ji hoza şedadan ketîyane û bûne Erebe! Hoza Elûşan di dema îro da bi xwe re Ereb dibêjin. Tiştên ko hatî gotin û dibêjin, min wekî gotinên mîrovên hêja û bi rûmet anî ser rûpelên kaxezê...

# DENGBÊJ BAQÎ XIDO

**Imer Kalo**

*imerkalo@yahoo.com*

( Kobanî - Sûriya )




**H**unermend û dengbêjê deyşta Sirûcê û herêma Kobanî Baqî Xido lawê Xidoyê Hindawê û E'mşa Mesto, di sala 1913 an de li gundê Miktelê li herêma Kobanî ji dayik bûye, û di çûkaniya xwe de ta pola pêncan di dibistanê de xwendiye, û di 15 saliya xwe de jî dest bi stran û hunerê kiribû. Baqî Xido û du xwîşkan ji bavê xwe mane, û ew du caran zewiciye û 12 kurr û 8 qîz jê peyda bûne.

Ji stran û berhemên wî yên ku awaz û gotin taybet yên wî ne evin: Bêmal, Dilo, Delalê qîzikan, E'wnî, Ehmed Menal, Keleş Xem, Salih û Kejê, Baviko û Xalo ne.

Ji stran û destanên filiklorê kurdî yên ku Baqî Xido bi şêweyê xwe yê taybet strane evin: Destana Dewrêşê Evdî û Delalê E'dûlê jî ji xeyala xwe xistiye ser wê destine, û ew 6 demjimêran straye, Teyar û Xezalê 5 demjimêran straye, Memê Alan 1 demjimêrê straye, Cembelî, û Xec û Siyamend û Hisên Begê Zîlî ne.


Kemanîstê ji Kobanî Mihemed Xelîl Xazî ji Baqî Xido re li kemancê dixis, û herdu tembûrvanên ji Kobanî Mihemedê Hadî û Mihemedê Gulî jî jê re li tembûrê dixistin.

Navê papîrê hunermend û dengbêjê navdar Baqî Xido Hindawê bû, Hindawê ji aliyê deyşta Herranê ya parêzgeha Riha ya Bakurê kurdistana ye, ew xwedî pez bû û bi sedema koçeriyê berê xwe dabû deyşta Sirûcê û herêma Kobanî, û li gundê Miktelê bi cih û war bibû, û ta roja îro neviyên wî, ango zariyên Baqî Xido li herêma Kobanî dijîn.

Her wiha Xido lawê Hindawê jî bavê Baqî Xido li gundê Miktelê jiyana xwe domandibû, û demekê li gundê Şêranê jî rûniştibû, û bi hunermendê ji Kobanî Mişoyê Bekebûrê re dost û hevalî kiribû.

Ji giringtirîn stran û destanên ku Xidoyê bavê Baqî Xido digotin, Dewrêşê Evdî û Xezalê bûn, herweha Xido li gel hunermend Mişoyê Bekabûrê seredana Mîr Celadet Bedirxan li paytexta Sûriyê - Şamê kiribû, û di wê demê Mîr Celadet di hejmareke kovara Hawarê de nivîsek li ser Xido û Mişo nivîsandibû.

Baqî Xido demekê li gundên herêma Kobanî wekî gundê Xerab Balê û Têrrî xocelixî û melayetî kiribû, û gellek kes li ber destên wî fêrî xwendinê bibûn, û ew derdora du salan çawîşê belediya Kobanî bû, û demekê li gundê Şêranê jî rûniştibû û nasnameya wî ya fermî li ser kutûkê gundê Şêranê yê ser bi herêma Kobanî ve ye.




Baqî Xidio di jiyana xwe de fêrî pênc zimanan bibû, wî bi zimanên Kurdî, E'rebî, Turkî, Ermenî û Frensî dizanîbû, û ew li çar welatên Sûriyê, Î'raqê, Libnanê û Turkiyê geriyabû, carekê ew û kemanîst Mihemed Xelîl Xazî ji aliyê komeleya El-erz ve li welatê Libnanê hatibûn vexwendin, û bi wê boneyê seredana Libnanê kiribûn.

Di dawiya jiyana xwe de, hunermend Baqî Xido hez nedikir ku li dûrî bajarê xwe Kobanî bimîne, û ji zariyên xwe re digot, ku ew nikare li dûrî Kobanî bijî, û ew hezdike di nav merî û dostan, û heval û milletê xwe de bijî, û hêviya wî ya dawîn ew bû, ku li bajarê Kobanî xatir ji cemawer û milletê xwe bixwaze û koça dawîn bike.

Baqî Xido di 7ê Şubata sala 2009an de, li bajarê Kobanî koça dawîn kir, û bi merasîm û beşdarbûneke cemaweriye mezin ji aliyê xelkê Kobanî ve, ew li goristana gundê Termik yê ser bi Kobanî ve hatibû binax kirin.

## ROJHILATÊ ALMANYAYÊ Û ÇAND

**( Beşê 4 ) ... Dûmahîk:**

-pirtûkxane, entîkxane û firoşgehên pirtûkan û tiştên tûrîstan mirov rastî şopên kesên wek Johann Sebastian Bach (Bax), Wieland, Liszt, Strauss, Nietzsche û kesine dine navdar dihêt. Li Weimar gellek civînên navdar yên derbarê desthelatdariya Almanya de cîh girtine. Ne tenê bendên dewleta almanî ya ku wek "Komara Weimar" dihêt nasîn di sal 1919 de li vir hatine nivîsandine lê her weha hinek bendên qonaxine tarî di dîroka almanî de, wek yên di dema Naziyan de.

Li Weimar gellek koşk û xaniyên xweşike ji demên par hene. Hinek ji wan hatine tamîrkirine, hinekên din dihên tamîrkirine û hejmareke ji wan di rewşeke ne baş de ne. Bêguman xanî dê li vir pirr ji beşên rojava arzantir bin. Em serîkî li xaniyê ku Goethe di baxçeyê mezin de carine bi kar dihanî jî dixin. Xanî ta îroj hatiye parastin. Sê-çar jinên ji bajêr li doraliyên wî di nav mitan û kulîlkan de di kar de ne, bi miqayitî û evîndarî bêyî pere vî karî dikine. Ji bêxçe ne dûr goristaneke kevnar heye, goristaneke balkêş e çimkî tê de gorên ji sedsalên par hene û li hinek beşên wê tevahiya, yan pirraniya, endamên malbatekê li kêleka hav hatine binaxkirin. Li ser kevirên hinek goran peyvên bedew wek diyariya ji mêrekî bo jina xwe, yan wek pesindariya mirovekî bi şan, hatine nivîsandine. Di nav gorên kesan û malbatan de yên navdar jî hene, wek yên mîran, nivîskarên mezin, fîlosofan, zanyaran... Dû re em dîsa vedigerin navenda bajêr, zû çerxeke din di nav taxên wê de didin xwe, bi keserekê xêtir ji Weimar dixwazin û beri didin Leipzig.

Ber biçin navenda bajarê Leipzig em serîkî li *Völkerschlacht Denkmal* dixin. Tevdêra lêkirina vê bînayeta seyr di salên dawîn yên sedsala 19emîn de dest pê kiriye û ew di sal 1913 de vebûye. Ew hatiye çêkirin ji bo bîrhanîna serkeftina hêzên ji neteweyên cuda li dij hêzên Napoleon (Ji 14 ta 19ê meha 10em ji sal 1813 hêzên yekgirtî yên rûsî, Prûsiyaya almanî û swêdî li doraliyên Leipzig di cengên li dij hêzên Napoleon de bi ser keftibûn. Ji dora nîv milyon leşgerên di van cengan de beşdar dora 100 000 şervanan hatibûn kujtin). Şûneke bi heybet e, tê de heykelên mezin û seyr hene ku nûneriya bawermendiya bi Xwedê, wêrekiya bokeyan û berxwedana li dij hêzên neyar dikin. Dema mirov radibe beşê jorîn dîmenên bedew ji Leipzig û doraliyên wê wek wêneyên rengîn xwe raber dikin. Heta li vir be jî, wekî li rawesteka trênan ya Leipzig ku di sedsala 19emîn de mezintirîn rawesteka li Ewropa bûye, tamîrkirin cîh digirêye.

Li navenda Leipzig gellek şûn û mixazeyên xweşik hatine çêkirine lê em agahdar dibin ku hinek kesan û şirketan bi encama hêviyên mezin ziyaneke aboriye mezin dîtine. Dewlemend û şirketine rojavayî weha texmîn kiribûne ku rewşa aborî û bazirganî dê li bajarê ku berê yê DDR bû zû şên bibe lê wek wan dipa nebûye. Dîsa jî li her derê tamîrkirin berdewam e. Li vir, wek li Dresden, kilîse û şûnine ku di dema şerê cîhanî de hilweşiyabûn, dîsa wek orijînalên xwe dihên çêkirine.

Em serîkî li gora Bach dixin ku di kilîseya St Thomas de ye. Ji wê wê de kilîseyeke din heye ku tê de "Tevgera Azadiyê" bi şêweyên aştiyane di salên dawîn yên DDR de xebata ji bo azadiyê dikiriye.

Çiqa Leipzig bajarekî xweş û xwediya çandeke dewlemend bû jî bajarê Dresden bi min ve şêntir û xweştir xewinî. Li vî bajarî mirovên li ser tax û kolanan, gerok, xwaringeh û çalakî ji Leipzig bêhtir in. Dresden di rojên dawîn yên şerê cîhaniyî 2yem de bi şêweyeke bêhûda ji aliyê firrokên hevpeymanan ve hatibû bombekirin. Gellek Alman weha bawer in ku pêdivî bi wê bombekirina bêhûde nebû, ku dewletên hevpeyman bi mebest, bo cezakirina Almanan, di rojên dawîn yên recîma nazî de weha kiribûn. Li bajêr tamîrkirin û avakirin hîn jî berdewam in. Hukûmeta almanî wê bizavê dikêye ku alîkariya xurtkirina avakirinê bike û beşekî ji şirketên pîşesaziyê li van herêman bi cîh bike. Hema bi çend rojan li dû serilêdana me min di rojnameyekê de xwend ku şirketa BMW ê hejmareke ji otomobîlên xwe ji vir û şûn ve li van herêman çêbike.

Çemê Elbe yê ku di navenda bajêr re derbas dibe bajêr hîn xweşiktir dike. Koşkên kiral û mîrên demên par, koşka opera ya bajêr û baxçeyên bedew bajêr dixin nav lîsteya wan bajarên cîhanê ku mirov bîre serilêdana wan dike. Hevalên almanî şûna ji bo razanê li nik malbatekê girtine. Odeyên wan ji bo kirêkirinê amade kirine gellekî baş in û pirr ji yên otêlan arzantir in. Em du rojan û şevan li vî bajarî dimînin û jê têr nabin. Ji wir em beri didin Berlînê.

Belê, welatek bi encama karbidestiya recîmeke şerûde û şerekî cîhanî, şerekî ku dora şeş salan ajot û bû egera kujtin û brînkirina bi milyonan mirov û ziyaneke bêhûde, ji hev qetiya. Almanya ne tenê ji hev qetiya lê bû xwediya du dewletên neyar û hevrik, du dewletên bi siyaset û sîstêmên ji hev cuda. Va serpêhatiya dîrokî jî wê yekê diyar dike ku siyaseta bêyî berpirsiyarî ya dewletekê, rêxistinekê yan partiyeke desthelatdar dikare gelan di kortên pirr kûr wer bike; dikare ne tenê nifşekî neteweyekê têxe nav dojehê, lê her weha wê encamê bide ku nifşên siberojê jî bi dirêjiya salan nerxê wê siyaseta şaş û malwêran bidin.

Li dû derbasbûna 45 salan bi ser dubeşkirina Almanya re, salên ku tê de nasname û xusetên xelkê her du beşan dest pê kiribûn ji hev cuda bibin, her du beşên welêt di sal 1990 de dîsa bûn yek welat. Li dû yekbûna Almanya di bin desthelatdariya hukûmeteke federalî de û derbasbûna salan, hîn jî bandorên recîma nazî û veqetê li rojhilat dihên dîtin. Çawa be xewna Almanan ku her du beşên welatê wan dîsa bibin yek bi encama guhertinên cîhanî bû rastiyeke li holê. Li dû 50 salên din ew 45 salên veqetê dê bibin beşekî ji dîroka demên par, lê dîrokeke bi janê dagirtî.

Wisa jî va gotara derbarê rojhilatê Almanyayê de bi seri dibe. Hêvîdar im agahiyên tê de bo xwendevanan balkêş û bi sûd bûn. **( Dawî )**

# JI ÇÎVANOKÊN YABANÎ

# KEVIRBIR

Amedekirin
Xiyas Hisên
dillehii@yahoo.com
( Kobanî - Sûriya )



**H**ebû nebû kevirbirek hebû, ku herroj berve zinarek girs li kêleka çiyakî mezin diçû û çend kaşî ji bo kêlên goristanê yan ji bo avakirina malan qutdikirin. Qenc coreyên keviran nasdikir, ku her yek ji bo pêdivîyeke cuda bikardianî. Û ji ber ku baş guhdida karê xwe, kiryarê wî pirbûn.

Wextekî dirêj pir kêfxweş û razî bû, û tiştek ji karê xwe çêtir nedixwest. Di nav wî çiyayî de perîyek rûdinişt, û carina li mirovan derdiket û bi her hawî alî wan dikir ji bo bi saman û maldar bibin.

Lê tu carî, kevirbir ev perîya han nedîtibû; û tenê serê xwe dihejand, digel rûyekî nebawer, wexta kesekî li ser wê diaxivî. Lê demek hat ku hişt nerîna xwe biguhere.

Rojekê kevirbir kêlek rahişt û çû xanîyê zengînekî, û li wir hemû rengên pertalên çeleng dîtin, ku tew di xewnên xwe de nedîtibûn.

Ji nişka ve, karê wî yê rojane bi wî zortir û girantir bû, û hat û ji xwe re got:

"Ax, xwezî ez peyakî maldar bama, min dê karîba li ser textekî hawîrdor bi perdeyên hevirmêş û rêşîyên zêrîn xemilandî raketibama; çi qasî ez dê kamîran bama!!" Dengekî bersiva wî da û gotê:

"Xwesteka te hat bihîztin; û TU dê bibî peyakî maldar!" Dema kevirbir ew deng bihîzt li hawîr xwe niherî, lê ma karîbû kesek bidîta!?" Fikir kir ku ew giş xeyalê wî bû, paşê alavên xwe rakirin û berve mal çû; ji ber ku di xwe re nedidît ku karekî din wê rojê bike.

Lê gava ku gihişte xanîyê piçûk yê ku lê dijiya, matmayî di cîyê xwe de rawestiya, ji ber ku li şûna kulika wî ya textîn qonaxeke bilind tijî navmalên şeng û yê herî xweşik text bû, ku di her alîyî de mîna yê ku dilê xwe bijandibûyê. Ji kêfxweşbûnê xwe wenda kiribû, û di jiyana wî ya nuh de jiyana kevin zû hatibû jibîrkirin.

Destpêka havînê bû, rojê herroj gerimtir û tundtir dibû. Sibehekê germahî wiha zêde bû ku yê kevirbir bi zorê bihna xwe dida û distend, wiha jî biryar da ku ta êvrê li malê rûne.

Pir acizbû, ji ber ku tu carî hînnebûbû bê çawa wexta xwe weş derbasbike.

Û ji xwe re di ber qelşên perdeyan de li bûyerên kolanê temaşe dikir, dema erebeyek piçûk derbasbû, ku xizmetkarinî kinc heşîn û zîvîn ew dikişandin.

Di erebeyê de, mîrek rûniştibû û li ser serê wî sîwanek zêrîn hatibû rahijtin da ku wî ji tava rojê biparêze. "Ax, xwezî ez bes mîrek bama!" kevirbir di ber xwe de got, wexta erebe li serê qorzîyê ji ber çavan wendabû.

"Ax, xwezî bes ez mîrek bama, min dê karîba di erebeyek wiha geriyabama û sîwanek zêrîn li ser min bihata hildan, ez dê çi qasî kamîran bama!". Û wusa bû mîrek.

Li pêşîya erebeya wî komek mirov bi siwarî pêş de diçûn û komek din li paş wî bûn; xizmetkarinî kinc qurmizî û zêrîn ew rahijtibûn, sîwana bi-dilê-wî li ser serê wî hatibû hildan.

Her tiştên ku dilê wî dixwest yên wî bûn. Lê têra wî nedikir. Her dem li dor xwe dinerî ji bo hîn tiştekî bixwaze. Gava dît ku tevî ku gihayê avdide roj wê hişkdike, û tevî ku sîwan li ser wî ye roj bi roj rûyê wî reş dibe; bi hêrs bangkir: "Roj ji min xurttire; ax, xwezî ez roj bama!!!"

Perîya çiyê bersiv da: "Xwesteka te hat bihîztin! TU dê bibî roj!" Û bû roj, û ji ber hêza xweya balkêş xwe nepixand. Tava xwe avête jor û jêr, li ser erdê û di ezmanan de; şînkayî di zevîyan de tevde şewitandin û rûyên mîran tevî yên derwêşan reşkirin.

Lê di demekî kin de, hêdî hêdî ji xurtbûna xwe acizbû, ji ber ku tiştek jêre nema bike. Carek din nerzîbûnê canê wî tijekir; û wexta ewrekî rûyê wî nixwamt, û erd jê veşart, bi hêrs qîriya:

"Ma ewr tîrêjên min êxsîr girtine, û ew ji min xurttire!!? Ax, ez ewrek bama û ji gişan bihêztir bama!!"

Perîya çiyê bersiv da: "Xwesteka te hat bihîztin! TU dê bibî ewr!" Wusa bû ewrek, û navbera roj û erdê de xwe dirêjkir. Bi tava rojê girt û zeftkir, û kêfxweş bû dema erd dîsa kesk bû û gulhûrik bişkivîn.

Lê ew têra wî nedikir, wusa bi roj û hefteyan baran bi jêr de dirijand ta ava çeman bi ser kevîyan ket, û berhemên rizê di nav avê de miç rawestiyan. Hêza baranê bajar û gund hilweşandin, hew ew zinarê mezin, yê li pala çiyê, ji cîyê xwe neliviya.

Ewr matmayî bû li ber vê rewşê, û bi ecêbmayîn qîriya: "Ma qey zinar, êdî ji min xurttire!? Ax, xwezî ez zinar bama!"

Perîya çiyê bersiv da: "Xwesteka te hat bihîztin! TU dê bibî zinar!" Û bû zinar, bi hêza xwe pir pozbilind bû. Bi serberzî sekinî, ne germahîya rojê û ne xuşînîya baranê karîbûn ew bilivandana. "Ev ji hemûyan çêtire!" di dilê xwe de got. Lê rojekê dengekî nenas bal nigê xwe bihîzt, wexta li jêr niherî dît ku kevirbirekî keskîya xwe berdaye ser rûyê wî. Hîn diniherî hestekî lerzane di hindirê wî de geriya, û telaşekî girs jê şikest û li ser erdê pekiya. Wê çaxê bi ingirînî qîriya: "Ma lawekî axêyî nekes ji zinarekî xurttire!!? Ax, xwezî ez mirovek bama!!!"

"Xwesteka te hat bihîztin! TU dê dîsa bibî mirov!" Wusa bû mirovek, û bi xwîdana birûyê xwe dîsa li karê xwe yê kevirbirînê vegeriya. Textê wî hişk bû û xwarina wî hindik bû, lê hînbûbû ku pê razî be, û nema xwest bibe tiştek an kesekî din.

Ji ber ku hew tiştên ne li cem xwe dixwest, û hew dilê xwe dibijand ku ji xelkê xurttir û bilindtir be; dawîya dawî kamîran bûbû, û carek din dengê perîya çiyê bihîzt.

## HOZANVAN Û PÊDAKIINA FANTAZIYÊ

**Sigmund Freud (1856-1939) ... Dûmahîk:**

-bêjin, ew heyînên cîhanê ji xwe re li gor hezkirina dilê xwe, di cîhanek dî ya nûjen de datîne, hema naye wê wateyê ku ew lîska xwe bê cediyet dilîze, ew ji dil de dilîze û acetên lîska xwe, wek tiştên berbiçav ên rojane dibîne, ji rastîniyê ve, tevî ku di fantaziyek xort de ye, bi dûr nakeve. Ciyawazî di navbera hozanvan û zarok de, di pêdakirina cîhana xwe ya fantaziyê de nîne.

Hevmaliya zimanê helebestvanî û yê lîska zarok jî her maye, û hozanvan peyvên wilo bi kar tîne, ku "lîsk" têde ne. Sigmund Freud sê peyvên wêjevanî yên giring: "Lîska evînî", "Lîska şîniyê" û "Lîskvan" wek nimûne tîne zimên.

Zarok mezin dibe û "Lîsk" her bi wî re mezin dibe, her di hindirê wî de dimîne, lê ji ber ku pêwîste ew dev ji wan "Lîskan" berde, bi wî re xemgîniyek navxweyî pêda dibe, êdî ew lîska xwe di "henek û yariyan" de dibîne. Ji lîska bi tiştan diçe ser lîska bi peyv û wateyan.

Li vir nema ew bi acetin berbiçav û di nav destan de dilîze, ew ziman, peyv û bêjeyan bi kar tîne, hema ew her dimîne "Lîskvan" û ji cîhana fantaziya xwe dernakeve, bêtir firehtir dike, li ser wê şêweyekî taybet ji peyvdariyê pêda dike, û bi wê yekê dilşad e û kêfa cane wî mezin e. Ewê mirov baş dinase, dizane ku mirov nikane bi asanî dev ji wê kêfê berde, ew kêfa ku di "lîskê" de dîtiye…

Zarok fantaziyên xwe yên di lîskê de pêda dike, çi bi tenê xwe be û çi bi hogiran re be, ji kesî fedî nake û venaşêre, hema mirovê gihîştî fedî dike, wan fantaziyên xwe ne wêre aşkere bike, ew bi gelek çêrok û wêne û lîstikên wêjevanî dipeçine, bi tabloyek, ku pir caran nafêhmkirî û "*Soryalî*" dide der û belav dike.

Di hiş û dilê zarok de, yek daxaz her heye, ew bibe mêrekî gihîştî û gir, karibe her tiştekî bi xwe bike. Ev daxaz wî dilivlivîne û di lîskê de ber bi avakirina cîhana fantaziya xweyî ve kaş dike. Li ba kesê zarotî li paş xwe hêştî, daxazên bi cih nehatîne dibin motora livîna wî ya fantaziyane, hezkirina keçekê, ku neçûye serî, dikare wî rake balaxaneyek fantaziya bê wekanî.

Fantaziyek di nêv sê deman de digere an difire: Niha, berê û dema li pêş. Mirov tiştekî, bûyerekê an kesekî dibîne, yekser tiştek, bûyerek an kesek di dema berê de tê bîra wî, an daxazek bi cî nehatibû, fantaziya mirov wî dibe dema li pêş û rewştek pêjinî „*xeyalî*" ji xwe re pêda dike, cîhanek fantaziyê, ku têde ew daxaza di dil de maye bi cîh tê…

Divê em têkiliya fantaziyê bi lîskê re hîç ji ber çavan winda nekin.

Tiştekî dî yê balkêş di vê fantaziyê de heye, ew jî kesaniyek serekîn e, weku dixuye ji aliyê hozanvan û çêrokvan ve, her tê paristin, û bi hemî hêza xwe bizavê dike, ku em ji wê kesaniyê hez bikin.

Di fantaziya hozanvanan de, tiştekî ku em bi destan dihîsin an bi çavan û guhan dibînin û diguhin, dikare bibe nîşana kesaniyekê an ciyê wê kesaniyê di helbestê / berhemê de bigire, gul û heyv di gelek stran û çêrokan de ciyê dilberê digirin. Li ba Shakespeare, di „Bazarganê Vênîsiya"(*) de, her kesekî ku tê destê Porziya dixwaze, pêwîste sandiqekê ji sê sandiqan hilbijêre, yek zêrî, yek zîvî û yek qurşînî ye.

Di yekê ji wan de wêneyê Porziya heye, yên dî vala ne. Şehzadeyê Marokî ya zêrî hildibijêre, vala derdikeve, şehzadeyê Arragonî ya zîvî hildibijêre, ew jî vala derdikeve, hema hezkirîyê Porziya ya qurşînî hildibijêre, di wê de wêneyê dilbera wî heye û wê li xwe mardike.

Her yek ji destxwezan berî sandiqa xwe veke di cîhana xwe ya fantaziyê re digere û egeran bo standina biryara xwe dibîne. Sigmund Freud dibêje ku Shakespeare ev çêroka sê qutîkan ji „Gêsta Romanorum" biriye, ew berê di nav mirovatiyê de hebûye, lê sê keçikan di „Gêsta Romanorum" de dixwastin kurê Qyser ji xwe re bistînin.

Tiştê balkêş ewe, ku Shakespeare carek dî di „Şah Lîr" de, li vê lîstikê vedigere, gava şah ji bo hersê dotên xwe dibêje, ku ya bêtir ji wî hez bike, wê dêrîna *„mulkê"* xwe ji wê re bihêle û ewa ji wî hezneke û bihayê wî nizanibe, êdî ne dota wî ye û mafê wê di dêrîna wî de tune ye.

Herdu dotên şah, Gonerîl û Rêgan para xwe bi hezkirina bavê xwe distînin, lê Kordêliya „*Cordelia*" bê par dibe. Li ba S. Freud sê kesanî yên ji hev cihê, sê jinên ne wek hev di hersê berhemên mirovî yên giranbuha de tên berçavkirin, hema her carekê bi şêweyekê, li gor fantaziya hozanvan / berhemdar û lîsk her dimîne ew lîsk. *[Di efsaneyên kurdî de jî, sê bira an sê xûşk hene.]*

Di efsaneya Girîkî „*Yûnanî*" de jî pêwîste Parîs jî ji nav sê xwedîkan yekê hilbijêre. Ev lîska mirovî fantazîkirina viyan û daxwazan, ku bi şêweyin wêjevanî yên carina baş û bêmirin, ji aliyê hozanvan/ çêrokvan ve tên pêdakirin, li ba S. Freud tev li bîranên zarotiyê dibin, bi gelek çarikan mirovatî zarotiya xwe dipeçine û pêşkêş dike, wekî kûzikên ku ji heriyê tên pêdakirin, her yek şêweyekî distîne, lê di binyada xwe de tev ji yek gola heriyê ne…

## ROJNAMEYA KURDISTAN


کردستان

**R**ojnameya Kurdistan di 22ê Nîsana sala 1898an de, ji aliyê Mîr Miqdad Mîdhed Bedirxan ve li Qahîrê derket, û bû destpêka weşandina yekem rojnameya kurd û Kurdistanê, û ew wekî karekî rewşenbîrî û neteweyî di nava kurdan de tê naskirin.

Roja destpêka derxistina rojnameya Kurdistan ji aliyê hemû sazî û dezgehên kurdî ve, weke destpêka rojnamegeriya kurdî tê pejirandin û pîroz kirin.

## JI GORISTANAN

### GORA

### Hunermend

## MIHEMED ŞÊXO

### ( 1948 - 1989 )

### Li bajarê

## QAMIŞLO



## REŞÎD HEMO



**1925 - 2010z**

**S**iyasetmedarê kurd yê navdar Reşîd Hemo (Bavê Qedrî) di sala 1925an de li gundê Hobka li nahiya Raco ya herêma Efrînê li Rojavayê Kurdistanê ji dayik bûye.

Di sala 1951an de, Reşîd Hemo li gel hin hevalên xwe Komeleyeke Rewşenbîrî li Efrînê avakiribûn, û çalakiyên rewşenbîrî çê dikirin, di pişt re hikûmeta Sûriyê komeleya wan girtibû, û Reşîd Hemo û hevalên wî, demekê ew xistibûn zindanê.

Di sala 1952an de, Reşîd Hemo li bajarê Helebê di riya kesayetiya ji Kobanî Mihemed Salih Xano re tevlî Partiya Komanîst ya Sûriyê bibû, û di nava wê partiyê de xebitî bû, ta ku di sala 1954an de bibû kandîdê wê partiyê di hilbijartinên perlemana Sûriyê de.

Di pişt re, û ji ber hin nakokiyan û raperîna hastên netewî yên kurdî li Kurdistana Sûriyê, Reşîd Hemo di sala 1955an de dev ji Partiya Komonîst ya Sûriyê berdabû.

Reşîd Hemo li welatên Sûriyê û Libnanê û Turkiyê û Iraqê û Rûsiya geriyabû, û di sala 1993an de dev ji xebata siyasî berdabû, ew di wê demê de endamê polîtbîroya Partiya Demoqrat ya Pêşverû ya Kurd li Sûriyê bû.

Di roja 17ê meha 12an - Berçilleyê sala 2010an de, Reşîd Hemo di bûyereke çûnûhatinê de li ser riya Rodko ya di navbera Qamişlo û Helebê de, li nêzîkî bajarokê Til Temir, di temenê xwe yê 85 salî de jiyana xwe ji dest dabû.

Di roja 19ê wê mehê de jî, ew li gundê wî Hobka li nahiya Raco li herêma Efrînê hatibû binax kirin.

## TABLOYÊN DOSTANIYÊ (3+4)




**Xada Siwêd**

*ghada-swied@hotmail.com*

( Şam - Sûriya )





### SPASÎNAMYEK ... Dûmahîk:

Spasiyên germ ji boyî hemî dost û hevalên ku ji welatên dûr bi hawara min ve hatin, bi taybetî yên ji Swêd û Danmarkayê, Beljîka û Holandayê.

Her wisa spasiyeke taybet bo westan û dilsozî û destpakiya birêvebirên Komeleya Hêlîn a Kurdên Essena Elmanyayê yên ku hetanî xuleya dawîn li teniŞta min man û bi min re darbesta birayê min spartin goristana Essenê .

Bila serê we hemiyan ji me re sax be. Bila hûn û ezîzên xwe û bila gelê kurd hetahetayê di nav xêr û xweşiyê de bimîne.

**Ehmedê Huseynî**

# ZAROTIYA NEYNIKEKÊ Û TIŞTIN DIN

**Roman - Xelek ( 9 û Dawî ) ©**

**Pîr RUSTEM**

*pir1963@gmail.com*

( 'Efrîn - Sûriya )



- Vexwarina mey mînakeke û pir tiştin din jî hene; mîna baweriya we bi qudoşiya hersê aqanîma û baweriya ku, Yeso lawê Xwedêye.. û pir tiştên din. Hema we û heya bi roja îro, baweriya xwe bi Ola Îslamê ne aniye; ango we bi rengekî fermî û ji aliyê Baba û Keniştê ve, Ola Îslamê ne hatiye pejirandin û ew jî ji aliyê xwe de li ser we dibêjin: ku hûn ji riya Îsa ya durist derketine. Evan gotinan hêşt ku, çavên herdu kalemêran beloq bibin; ên Agob bi açiqkirin û agahiyên di destê evî xortî de û yên Kalemêr bi tênegihêştina wî ya heya bi roja îro ku, dostê wî tevî komele û civata xwe, hîne baweriyên xwe bi wî î Ola Îslamê nakin.

- Ez dibêjim ev tiştine biçûkin û ji nakokiya di navbera hinek sûdegirtinan de hatiye û ewê di pêşerojan de bêne çareserkirin, ango ti cudayiyên mezin di navbera baweriyên bingehîn ên evan olên asûmanî de, tinen e.

- Çawa tinene û wîn, heya bi roja îro, bi Îslamê ne bawerin ku, ew jî oleke asûmaniye. Ji berî ku, Koçer bi peyive, Kalemêr pirsîbû.

- Ne xeme, ezê ji te re bi cih bikim ku ew tiştên te li ser olên kevin gotibûn, dê li ser te bêne jimartin û ne li ser ewan olan û ev yeka dihêle ku, ez bi bîranînên xwe re vegerim ji berî nuha bi deh-dunzdeh salan. Ez hîne di rêza dehan de bûm, mamosteyê me jî mîna hemû mele û feqeyên ku, li ser diyarokan radiwestiyan bû, eger ku wan çi got gerek yekî seriyê xwe ji wan re bi hejanda û ji gotina wan re erê bikira, bi behana ku ew ji Quranê di axêfin û çê na be ku, ti kes dijberiya gotinên pirtûka pîroz bike, evî mamosteyî jî li me wilo dikir. Lê di rojekê de, ramanek di seriyê min de teqiya û min kir û nekir ew bê deng nema û gava ez jê pirsîm:

“Mamoste ma çêdibe yek xûşka xwe bibe”. Evê pirsa min hêşt ku şagirt, tev, dev jihevkirî bimînin û mamoste jî bihin teng dibe.

- Ev ne ti pirse. Agob got.

- Wî jî wilo got. Bes min xwestibû ku ez çêroka helal û heramiyê, di evê gedûkê re, vekim. Û piştî ku wî rê da min, da ku, ez pirsa xwe ravekim, min bi zelalî gotê: weke ku em dizanin û me xwendiye ku, di destpêka peydabûna mirovantiyê de, ji bilî du kesan tinebûn û sedî-sed zarên wan xûşk û bira bûn û wilo em têdighên ku, bira xûşka xwe li xwe mehir kirî. Bersiva wî ji min re, weke ku yek gûman dike ku, di wê hîngê de ji bilî ewan, du kesan; Adem û Hewa, tinebûn da ku zaroyên xwe bi hevdu biguhêrin.

- Belê, ev rastiyek bû. Agob xwest zanibe; ka ev xort çi dixweze.

- Ezê pirseke din ji te re bikim, weke ku min ji mamosteyê xwe kiribû; eger ku Xweda dizanî ew yeka, zewaca xûşk bi bira re, tiştekî gunehe, wî çima Adem û Hewayeke din ne afrandin, da ku, em neketana evê pirsgirêkê, tevî ku, weke wîn dibêjin: “eger ew bixweze çi bike dê bike”. Ew di vir de radiweste û gava dibîne ku, kesî li ewî venegerand, ew careke din vedigere mijara ku, rik li ser çêbûbû û dibêje.

Eger ku yek vegere evê pirsgirêkê û li gor dîtinên min, dê bibîne ku ji bilî sê riyan li pêş wî tinene; a yekê ku ev ton jinanîna, di-destpêka mirovatiyê de, tiştekî normal bû û weke ku, civatzan dibêjin: hîne civata mirovatiyê ev perçebûnên civakî nasnedikirin, belkiya dudiwan jî dibêje me ku, Xweda û ne weke ku, li ser tête gotin; ewî nedikarî hertştî bikira, da ku, Adem û Hewayeke bidanai afirand û ya sisiyan jî ku ewî, ev jinanîna, di destpêkê de helal kir û paşê rabû gunehbarkir. Û weke em dibînin ev hersê rê jî me dighînin bê baweriya bi Xwedê; eger ku em bibêjin wî helal kir û me jî heram kirî, em wilo li dijî vîna wî diçin û eger ku, em a dudiyê bigrin û weke me dît, em dighên ku, Xwedê ne her tiştek xwest gereke bibe û yekî wilo ti cudayetiyên wî bi çi mirovekî din re nînin û ev yeka pesneke wî tineyî dike û ne heceyî em bibêjin ku, ew dihêle yek bibêje; hebûn û tinebûna Xwedêyekî wilo, dê weke hev be. Riya sisiyan jî me dighîne ewê baweriyê ku, Xwedê jî weke me dikeve şaşiyan û hin caran jê vedigere û ev Xwedê jî weke yê çûyiye. Piştî ku Koçer gotina xwe bi dawî dike, heya bi demekê ew ker û lal dimînin, lê pir naçe û Agob ewê bê dengiyê diçirîne.

- Yek dikare bibêje ku, ev jî hikmeteke wî ye.

- Em jî dikarin bibêjin ku, ev riya revêye. Kalemêr dibêje û ji Koçer dixweze ku, bi xêra xwe, çayekê çê bike.

- Ango tu dibêjî Xwedê tineye. Agob dipirse.

- Bersiva evê pirsê li ba min tineye û ezê nîvê jiyana xwe bidim ewê ku, karibe bersiva evê pirsê bide min. Lê tiştê ez têdighêm, ku evan dezgehên olî hêştin koma Xwedêyan di yek Xwedêyî de kom bibin û bi ewê yekê re destlat û diktetoriya wî bêtir û firehtir kirin.

- Çawa, min eva dawiyê fêm nekir. Di dema ku ew radibe, da ku, çaydanê çayê bîne, Agob dipirse û Koçer bi rûniştina xwe re û dagirtina piyalan bi çayê, vedigere mijarê.

- Li gor dîtina min û eger ku, Xwedêyek hebe, dê ne weke evî Xwedayê ku, bi me dane naskirin be.

- Ka pesnên xwe ji me re bibêje. Agob bi hevoka xwe re nimêjeke bi lez dike û beratê ji Xwedayê xwe dixweze.

- Pir netirse; bi rastî, ji her mirovekî re Xwedayekî wî heye. Yê min jî û weke ku, carekê, min ew di xewnên xwe dîtibû; kalemêrekî heyştê-nod salî ye, tevde sipî ye, reşî û tariyê nasnake, ne jî dizane şer û nerindî çiye û dilovaniya wî jî bê sînore.

- Ango, tu dibêjî hesab, kotekî û dojeh li cem wî tineye. Kalemêr, bi riwekî vekirî dipirse.

- Na, ev tiştên wilo, evan dezgehên olî derxistin holê, da ku, perîşanên weke min û te bitirsînin û ew hemû zor û sitema xwe li seriyê me bimeşînin. Ez hertim dibêjim, eger ku em karibin Xwedê baş nasbikin, ewê hîngê, ewê ji me re negerek be û di çêroka dilovaniya wî de û da ku, em nêzîkî naskirina wî bibin, em dikarin evê mînakê bînin zimên; yekî ji we ku bi salên xwe gihêştibe şêst-heftê salî û bibîne neviyekî wî, yê yek salî, mizeretiyek kir; em bibêjin ku bi ser postê nimêjê de mîst, dê gunehê kê mezin be, yê wî an jî yê te, dema ku tu rabî û em bibêjin, ewkê wî jêke, ne ku tu hîne bi wî bigre û bavêje nav êgir û wî bişewtîne û ne carekê, her ku ew bibe rejî tu wî vejîne, da ku tu, careke din, wî bişewtîne. Vêca were temenê xwe bi yê Xwedê re bipîve, tu yê bibînî ku, tu ne mendalekî yek rokiye jî li gor temenê wî, dê çawa ewê bi law û neviyên xwe bigre û ji bo hin mizeretiyan, wan bavêje nav êgir. Te Xwedê yê min naskir. Koçer dinire ku, care pêşîne, çavên Kalemêr dibrûsin û têdernaxe ku, ronahiyek di hundirê wî de der bûye yan hêsirekê xwe negirt û seriyê xwe di wir re derxistî.- Bes wilo û eger ku, hesab û dojeh tinebe, emê wek guran bi canê hevdu kevin.

Bi pirsê re, ronahiya di çavên wî- **... Dûmahîk Rûpel: 15**

**ZAROTIYA NEYNIKEKÊ Û TIŞTIN DIN ... Dûmahîk:**

-de vedimre. - Tu dibêjî qey em weke mihîyan bi hev re dijîn. Agob bi tinazî dibêje, lê Koçer li ber ewê yekê naraweste.
- Min kêlîka çûyî jî got: eger ku em Xwedê nasbikin, dê hebûna wî, ji me re, negerek be. Ango her yek dê zanibe çi yê wî ye û çi jî li ser wî heye, tu dikarî bibêjî dê her yek bi xwe Xwedêyek be, têkeve şûna wî û bi ser evê yekê de jî, weke ku Îslam û ji berî ewana Someriyan jî gotî: Xwedê her tişt, ji roja zayîna yekî û ta mirina wî, li ser enî û depreşê wî nivîsandiye û wî gotiye; Evê bawermend be û ewê din jî dê gunehkar be, vêca û piştî evê yekê çima ewê bê û hesaban bi min re bike, ma negereke ku ez hesaban bi wî re bikim, çima hêştiye yek di xêr û xweşiyê de bijî û ew li dawiyê ew kesekî buhiştî be û di depreşê yê din de jî nivîsandiye ku, gereke ew ji yên dojehê be, çima ev durûtî. Lê ev jî hikmeteke wî ye.
- Tu dibêjî; nimêj û karên me giş bê sûdene. Agob dipirse.
- Ew ne bi hewceyî nimêja min û te ye, weke ku tu ne li hêviya alîkariya mendalê yek salî ye ku, ew bê û di avakirina avahiyeke ji deh qatan de, alî te bike.
- Bes wilo nerindî, reşî dê pir bibe. Kalemêr, piştî dudiliyeke dirêj dibêje.
- Belkî mendal mûdî bin, lê her tim ken ji girî şêrîntire û heya bi ewî mendalî gihîne jî, evê yekê nasdike û giriyê wî jî ji bo ku, ew bighe kenekî sipî.
- Demên ku ez li piş xwe dinirim; li dîrok û rewşa xwe ya çûye dimeyzînim, ez dighêm ewê baweriyê ku ya çêtir ewbû ku ez bibama rahibek û di dêreke kenargirtî de, bi tenê û dûr bimama. Agob û weke ku, yek bi xwe re biaxive, dibêje wan.
- Bi kêmasî ev rê li pêş we heye. Di ola me de ev tişt jî tine ye. Kalemêrvedigerîne.
- Ev yeka negereke û li dijî vîna Xwedê ye.
- Çawa li dijî vîna wî ye û yek dike ku, jiyana xwe gişî têxe raja wî. Agob bi bihintengî dipirse.
- Belê, tu dikarî bibêjî ku, ewî nerindiyekê dike û li dijî vîna Xwedê diçe. Binir, eger ku wî bidîta ev pariyê goşt bê sûdeye, dê ne afranda û demê ku, tu tê û wî dikujî, tu li dijî vîna Xwedê diçî.
- Tu dikarî evê yekê li ser mejî jî bibêjî. Kalemêr dibêje û her diçe pişta wî bêtir serrast û bi hêztir dibe.
- Ew jî rastiyeke û ji ber ewê yekê gereke mirov hertim bi karên sipî birame.
- Her yek li tiştê ku, gerekî wî ye digere. Koçer çavekî diqurçimîne û vedigerîne.
- Gotinên te xweşin. Lê weke ku, yek di kûraniya mejî de be, ew dibêje min: Evan gotinan bawer neke. Agob dibêje û li Kalemêr vedigere; gerek sibe bijîşk bê û li te binire. Û bêyî ku ew guh bide bersiva wî, radibe ser xwe û şev xweşiya wan dixweze, Koçer jî radibe û her yek ber bi odeya xwe diçe. Bi derketina wî re Kalemêr kûr bi wî dirame û ciwaniya wî bi rengekî din tê bîrê.
Piştî ku Koçerê Başûrî vedigere oda xwe û xwe li ser têxt dirêj dike, hestekînuh di canê xwe de dipelîne û wêneyên Xwedêyekî nuh di hundirê wî de ava dibibn; Xwedayekî sipî ku ti lekên reş lê neketine û ne jî dilreşi, êşkenciyê nas dike. Xwedayekî dûrî yê ku bi wî dabûn naskirin, ewî hertim ev wêne û karên kuştin, serjêkirinê ji Xwedê re ne dipejirand û digot; ev wêneyên yekî şerker û xûnî ye, ev wêne bêtir nêzîkî dêwekî xwînvexare, ji Xwedayekî dilovan.
Ew piştî demeke dirêj xwe di beyabûneke fireh de dibîne; ji kengî ve wî xwe dirêjkiribû netê bîrê, lê di êşa pişta xwe re dinase ku, demeke pir dirêj di ser wî re çûye û dema ku, çavan ji hev dike û di deryayeke reş û tîr wer dibe, yek ji piş vedêng li wî dike, ew xwe bi ewî alî de diqulbîne û bi ewê teqlê re çavên wî bi sûlava ronahiya ku, ji ezmên ve diherikî-
-dikevin û ew yeka dihêle ku, Koçer di cih de şiyar bibe û dibîne êşeke zirav di pişta wî de ye û hin tîrên ronahiya lempa cîrana li ser çavên wî lûsbûne.
Bêyî ku ew ji cihê xwe bilive dêst davêje cixarê û piştî ku, çend nefesên kûr dikşîne û dihêle nîvê cixarê bi rejî be, ew mîna ku bi yekî re bi axife bi dengekî bilind dibêje xwe: "belê, gereke Xwda wilo be.. û ew li hêviya nimêj, gotin û lavêjên min nemîne, da ku, ew pê mezin bibe û ew dilovaniya xwe, piştî ewan bergeran, nîşanî min bide. Divê ev tişt ji ber xwe, ji derûn û surûşta wî bin û bêyî ku, yekî din bîne bîra wî û bi ser de jî, ewê ku berê ne mezin be dê bi van karên min mezin nebe.. . Gereke ew li karên min binire weke ku, yek li mûdiyên zaroyan dinire; ku ev hemû kar û gotinên me bê merm û armancin, hema jiyan hebûneke tewşe û bê mereme. Ew li van kar û nimêjên me, weke ku em li lîska zaroyekî xwe dinirin, binire û eger ku zaroyekî mirovekî çêbibe û ew di rojên xwe yên pêşî de, weke mezinan rabe û rûne, dê ti kes bi wî şanebe. Em jî zarên Xwedê ne û ew bi mûdiyên me şa dibe.. heya ku bibîne, me bi xwe de rîtî jî, dê dîsa bikene û ne bes wilo ..".
Dê axaftina wî, bi xwe re, dirêj bikra. Lê dîtina Şêrînê di devê pencerê de û bi hejandina destên wê re û wan çend ramûsanên bi dizî, wêneyên Xwedê direvin.
Ew demeke dirêj, bi van lîskên ciwanan, di devên pencereyan de, diborînin. Û çaxa ku Koçer dibîne dê nema karibe xwe bêtir bigre, bi ramûsana dawî re nîşanî wê dike ku, gereke ew razin û bi berdana perdê re, ew xwe li ser têxt dirêj dike û pişt, demeke dirêj ew, careke din, winda dibe.

**- 10 -**

Bi tirs û di bin siya xewneke tîr de, şiyar dibe. Gewdê wî bi xwêdanê hatî şûştin û dike-nake ku, ew xewn bê bîra wî, lê deziyên wê di dest de dirizin û nikare titiştî bi dest xwe xîne. Bi çavlêketina li katjimêrê dinase ku, ber destê sibê ye û ji derketina, ji nav nivînan re zûye, nemaze ji yekî wekî wî re ku didît, xew karê herî bi sûdeye. Lê tevî evê naskirirnê jî xew ji çavên wî direve û ev bûye demeke ku, wilo sibê zû şiyar dibe û nikare careke din xew bike; xwe ji bin mitêlê dikşîne, bi hewceyî derketina avrêjê bû, wî xwest û ji berî ku cîran şiyar dibin, ew bi rihetî here û karê her sibe biqedîne, bêyî ku rêza wan mîna zincîreke bê dawî li ber derî dirêj bibe û her çendekî dengê yekî bilind bibe û bibêjêyê: "Tu çima xwe nakivêşî û tu zû naqedînî, qey îro şêkir belav dikin ku, hêştiye tu evqasî tê de bimînî". Û ew bihêle kenê pîrek û zarokan bilind bibe.
Evê yekê dihêşt ku ewê di hundir avrêjê de bi ustûxûzî û rûdêmekî beravêtî û bêyî ku, ew xwe rihet bike, ji devê avrêjê bête kişandin. Lê eger ku, yê di hundir de, yek ji ewên ku, ava rûyê wan rêtî ba, wî jî ji hundirê avrêjê de vedigerand û digot.: "ne tirse, ew pire û ewê têra te jî hebe ku, bihêle zimanê te, hinekî, şêrîntir bibe".
Ev bûyer du-sê caran bi wî re çêbûbû û hêştibû ku, ew dereng û piştî ku nema kes li ber deriyê wê dike qîr-qîr, derkeve avrêjê, tevî ku evê yekê dihêşt alavên wî yên mîzê bişewitin û di pêşerojan de dê binase ku, ew yeka bûbû sedama pêketina êşa gurçikan.
Piştî ku cezwê qehwê, yê dagirtî, di ber xwe de datîne, ew radihêje romana Elrîş a S. Berekat û xwe dixe nav nivînan. Ew hîne bi perê Selîm re difirî û bêyî ku, ew devereke paqij bibînin, da ku, dawiya koçeriya xwe bînin, qîrîn û hawarên keça Agob dikevin guhên wî û dihêlin du wêne di çavên wî de derbibin; mirina xûşka wî ya heft salî bi sedema wî û wêneya din jî bala wî bi ser Agob û Kalemêr ve dikşand, ka kî ji wan mir. Bi lez pirtûkê ji dest xwe davêje û ber bi derî ve dibeze.
Ew jî mîna ewên ku, bi qîrîna keçikê re kombûbûn, di deriyê Kalemêr de, û bi dîtina ewî pilindirê-

... Dûmahîk Rûpel: 16

**ZAROTIYA NEYNIKEKÊ Û TIŞTIN DIN ... Dûmahîk:**

-ku, nîvê odê girtî re, diqerime. Erê wî, pir caran, bihîstibû ku di hin rêlên Afrîka de mar û dûpişkin ne li gor girdên xwe yên normal dertên, lê ewî hîne bi gird û xişma mezinbûna evî pilindirî nedîtiye û ne jî pê bihîstiye; belkî ew bêtirî sed û pêncî kîloyî heye. Di ewê kêlîkê de û ji piş guhên wî ve deng bi şeşarekê dikeve û yeke din, kaniyên xwîneke reş di gewdê pilindir de derdibin û ew dixweze êriş wan bike, lê girdbûna wî nahêle ku, ew di derî re derkeve.

Çêroka pilindir û Kalemêr, heya bi mehekê, dibe stûna her rûniştin û axaftinekê. Rûniştvanên avahiyê pê rojên xwe derbas dikirin, ew bûbû çêroka wan a rojane û nemaze windabûna Kalemêr di roja derketina wî pilindirî de, hêştibû pirs li dû pirsê di mejiyê wan de biteqin, geh digotin: pilindir ew daqirtandî û girdê ewî dihêşt ev bawerî nêzîkî rastiyê be, lê hineke din jî derketibûn û nirîna wan j çêroka pilindirê ku, ne li gor baweriyan mezinbûbû, biyantir bû; ew bawerin ku, ev pilindirê gird, Kalemêr bi xwe ye û evê yekê dihêşt ku, çêroka Kafka bête bîra Koçer.

Çêrok ji hewşê dertê û dikeve devê rojnemevanan, bi sedan pênûs û neynikên kemîreyên tilvizyonan bi ser seriyên rûniştvanên avahiyê de dibarin û şevên wan kirin roj, heya gihêşt ku çend zanyarên biyolocî û li ser televizyona dewletê û bi baweriyeke kûr, dîtinên xwe yên olî bînin zimên û sedemên bûyerên wilo vegerînin nîşan û hinerên Xwedê ku, çawa ew, bi evan bûyeran, dixweze bi me bide fêkirin ku, ew carna hesêb bi derengî dixe, lê ti carî ji bîr nakê.

Serokê komarê jî, di evê çêrokê de, derfeteke gird dît ku, ew jî çend gotinan bike û bi bîr miletê xwe bîne ku, di bin serokatiya ewana ya hişmend de û bi rêdana Xweda, dê her tişt li cihê xwe be û bila qet ew ji evan dûpişk, pilindir û dijminan netirsin. Lê piştî mihekê her tişt mîna berê vegerî û ew çêrok û gotinan jî mîna bilî xwe, di bin siya pariyê nên, êşa dirana û toza kerikên qundereyên evî bajarî de winda bûbûn.

Di evê mehê de û piştî ku, rewşa wî gelekî teng û tenik bû, wî xwe avête bextêAgob ku, ew karekî jê re bibîne û soz da ku, ewê evê carê di kar de berdewm bike. Wî jî baweriya Koçer li erdê nehêşt, rojekê deng lê kir û ew bir cem dostekî xwe û ji ewê rojê de û her roj piştî nîvro, diçû xwaringeha nuh û di wir de jî karê jimartinî dikir û di roja pêşî de û bi xwesteka xwediyê xwaringehê re ku, gereke ew rihên xwe kur bike, Koçer naskir ku gereke ew rûmetgirtina xwe ji bîr bike; "zikê birçî û vala dihêle serî biçelmise û bitewe". Koçer di destpêka rûpelê xwe yê nuh de dinivîse û jiyaneke nuh ji wî re vedibe.

Koçer hertim ji riwê xwe yê kurkirî direve, lê belavbûna ewan neynikên di hundirê xwaringehê de, hertim dihêştin riwê wî yê kurkirî û tazî bide dû wî. Di piş maseya xwe de rûdine û hestekî zîz bi wî re çêdibe, lê ew hestê xweş bi kişandina cixarê re dimre û riwê wî yê kurkirî bêtir reş dibe. Bêyî ku ew li neynikan binire û bi ustûxûzî, ber bi cihê destşûştinê diçe, da ku, qehra riwê xwe, hinekî, zelal bike.

Lê ji berî ku maseya dawiyê li piş xwe bihêle û ji nişkeve, destek rêya wî digre û dihêle bala wî bi ser xwediya dêst ve bête kişandin. Jineke; di salên xwe yên dilşikestiyê de ye, mantoyê reş ku avêtiye ser kirasekî xewê yê sor nikare jiyana wê ya berdayî veşêre û çavan, bêtir, bi dû xwe xîne. Keftika wê jî şimitiye bin nigên danîştokê û rû û lêvên ku, bi sorekî tîr hatine xêzkirin li şûn xwe hêştine, lê xala ku di qirika wê de, bêtir, bala Koçer kişand û hêşt ew mîna mêxekî di ber maseya wê de bête venîştin. - Tu yê rûnî. Rûniştina wî dihêle rehên pîrekê, bêtir, ji hev bi dûrkevin û ew jî tev-hev bilerize, lê tirsa Koçer a herî mezin ji teqandinên ku, ji benîştê wê derdiket û di sîngê wî wer dibûn, dihat; ew tirsiya ku ew çivîka di sîngê wî de di dêv re bifre. Mêya di hemberî wî de jî, her diçû bêtir, bi nav lingên wî de diherikî û dengê benîştê xwe-bilindtir dikir. Ev bûbû meheke ku, hatiye û li xwaringehê kar dike û di evê mehê de riwekî nuh ji bajêr, nemaze ji mêyên bajêr re, didît; dihêştin ew bighê ewê baweriyê ku, çi mêyên evî bajarî hene tev kûndene. Ev pîreka di temenê pîrovî de, eva ku pir zaroyên weke Koçer di nav rehên xwe re derbaskirine, baş dizane çawa toxmiya wî dilop-dilop bimije û eger ku, hinekî din xwe bi nav ligên wî de berde, dê lehiya wî yê derbibe û ewê li ber lingan here. Destê Koçer, ji nav rehên xwe, vedigerîne ser masê.

- Em çi bixun. Koçer dengê xwe nasnake û dikeve gûmana ku, yekî din axifî bû. Jina pîrovî û bi dizî, bi xefka wî ya aşkere, dikene û ew evê mêtinê jî dide şûn û tenê du fincan qehwe dixweze. Mêtina wê ji lêvên fincanê re, careke din, lerzandina laşê Koçer bilind dike û lekeya reş-qehweyî, xasê sipî riswa dike û dihêle Can; xizmekarê xwaringehê, xasekî nuh li ser masê rêxe.

- Tuyê qehweyeke din vexî. Pirsa Can ewî biçûktir dike û bi ewî dide naskirin ku, ew ne yê ber masaye; ji her gorepanekê re peyayên wê hene û bêyî ku, ew seriyê xwe hilde, bi "na" bersiva wî dide. Di evê demê de jî û piştî pîreka pîrovî dibîne ku; ew pêtên di çavên Koçer de vemirtin, dêst davêje sîngê xwe û bi axîneke avî re, pişkokeke din rizgar dike. Destê wî jî, mîna kelekeke winda ku, di rojeke serxweş de derketibû nîvê deriya sipî, carna bi jor; bi ser pêlên sîng dikeve û pir naçe, ji nuh ve di gelî û newalan wer dibe û gava ku, ew nêzîkî lêvên wê dibe, ew careke din dêst datîne pêş wî û rê lê dibire.

- Ne li vir. Bêyî ku ew titiştî li gotinê zêde bike, radihêje fincana xwe û tiliya xwe têve dike û bi şûnmayiya qehwa di binê ewê de mabû, vedişêre û dibêje wî: tu dizanî ev ji çira dibe. Ew tiliya xwe, ya ku di torta qehwê de windabibû, dide ber çavên wî.

- Na. Koçer bi nezaniya şagirtekî nuh bersiva wê dide û dike ku, ew ne pir tiştekî pêwîste. Lê camêr bi rengekî rast û êjdilî pê ramya bû, bêyî ku ew bighe titiştî.

- Eger ku mêr evê şûnmayiya qehwê di "Ewkî" xwe bide, dê bihêle alêstina ewî çêjtir bibe. Jina pîrovî, weke zanyarekê û bi zimanekî ne alîgirtî, li ser mijara xwe diaxife û dihêle kela verîşiyê di hinava Koçer de der bibe.

- Em kengî hevdu bibînin; Siba berî nîvro were Çiyayê Seydo, te mizgefta wê..

- Hêdî-hêdî, çima sibe û ne anuha. Jina pîrovî lehiya wî dibire û bi gûman li ewî dinire û dipirse.

- Ezê xwaringehê bi ser kê de bihêlim; ez û xwediyê wê, em şûna hevdu digrin, ew bi sibê û ez jî bi êvarê. Û sibe berî nîvro ezê li mal bim û em dikarin...

- Qey tu ne birayê.. . Jina pîrovî têderdixe ku, Koçer jî ji xizmekarên xwaringehê ye û ne weke gûman kiribû ku, ew birayê xwediyê xwaringehêye. Bi evê têgihêştina xwe re, ew radibe ser xwe û bêyî ku, li pirsên wî vegere, ew ji xwaringehê dertê. Lê di devê derî de û piştî ku, mantoyê xwe li ser kirasê xewê, yê sor, dide hev û keftika reş bi ser lêvên xwînî de ber dide, bi kenekî tûj-kûndayî û dengekî bilind ji kerikên qundireya xwe, di pêpelokan re, der dikeve ser resîfê derve.

- Ew roj û ev roje û ev bû çend mehên din in ku, di ser karkirina wî re borîne û her ku, ew dikeve deriyê xwaringehê û keftikê ji ser lêvên xwînî hildide û kenê wê yê tûj-kûndayî li hundir belav dibe, dihêle Koçer bêtir ji nînikan bireve, da ku, nebîne, hinekî din, ji pozê wî winda bûye; "ezê ewî perçeyê bilind di rûdêmê wî de bişkînim". Ew her ku dihat û di pêşiya xwediyê xwaringehê de radiwstî û çav li pozê wî yê fireh û bilind diket û bi bîr dihat ku, pozê wî jî û herdiçe biçûktir dibe, Koçer ev hêviya xwe ji nuh ve avdide. Lê ji berî ku, ewî dikir hêviya xwe bi cih bîne, xwediyê-

... Dûmahîk Rûpel: 17

**ZAROTIYA NEYNIKEKÊ Û TIŞTIN DIN ... Dûmahîk:**

-xwaringehê digotê: “here qehweyekê ji mim re bîne”. Wilo derfet li wî dibirî û dihêşt ew bi ustûxûz, ji ber masê bi dûrkeve. Ev hêvî dê pir dirêj neke û ewê, di roja ku mamosteyê xwe di ber maseyeke xwaringehê de dibîne, evê hêviyê jî û bi carekê, bişewtîne. Û dê wilo bibe yek ji karkirên xwaringehê û ewê derengî şevê vegere mal û di êvarekê, digel Şêrînê, binase ku ewî bifna xwe windakirî. Îşev jî pir dereng mabû û ew dikeve qisweta Şêrînê; her şev ew li benda wî dima, eger ku çiqas dereng bima jî, ew li ber pencerê, li hêviya wî dima. Evê yekê hêştibû her sê gavan bike yek û dema dighe ber derî hinekî bihna xwe derdixe û êşekê di sîngê xwe de di pelîne û bêyî evê carê jî, weke ku hercar digote xwe; “gereke ez cixarê berdim”, nabêje. Vekirina deriyê derve dihêle ronahiya oda Kalemêr, di nav ligên wî re, bi derve de, bireve û dema ku ew ber bi deriyê wî ve derê, dengê pîrekekê dikeve guhên wî, dihêle ew bi şûn ve û ber bi odeya xwe ve bikşe û ji berî ku, ew derbasî hundir be, ber bi pencera keçika xwe dinire, ew jî û ji pişt perdê de destan jê re dihejîne û bi ewî dide fêm kirin ku, lempê pênexe, ta ku karibe dakeve cem wî û kes nizanibe ku, ew vegeryaye mal. Di şevên ku, ewana bixwesta hevdu bidîta, Koçer bi dizî derbasî oda xwe dibû û Şêrîn jî bi veşartî dadiket cem wî û îşev, ronahiya di oda Kalemêr de, pêwîstiyeke din bû ku, wê bibîne. Bi bêdengî dikeve odê, bihna lihêm û kefnikê dihêle ew berve pencerê biçe, lê ji berî ku mendela wê bikşîne, tê bîrê ku Şêrînê jê xwestibû, ew, bê deng, li benda wê bimîne. Bi şûn ve tê û li ser keviya têxt rûdine, hinek şilbûn di çarşefê de dibîne, lê ji berî ku lerizandin têkeve hinava wî, derî vedibe û reşantiya wê dikeve hundir. Bi girtina derî re ew xwe lê digre û di hembêza wî de bihna xwe berdide û di tariya odê de, ji bilî dengên bihnderxistinên wan ti dengên din namînin.

- Çima dilê te evqasî lê dide. Şêrîn dipirse û seriyê xwe dixe sîngê wî.

- Ev bû ji demekê de ew wilo bi hêz lê dide; çi di derketina cihekî bilind de û çi jî ku bixwezim cixareyekê bikşînim û carna jî ji berî ku, ez razim, lê ew bêtir di helwestên wilo de bi deng dibe. Wî bihna revê di bersiva xwe de dît, lê dîsa jî bawer nekir ku ev yeka ji tirsê dihat.

Bi xistina ku, Şêrîn devê xwe dixe yê wî, nahêle ew gotin û ramanên xwe heya bi dawî bajo. Koçer guçilê mitêlê dide alî û bêyî ku, wê ji hembêza xwe berde, dixe nivînan. Heya bi demekê ew di hembêza hev de dimînin û piştî ku, qeşeya nivînan dişewtînin, Şêrîn dêst davêje kenzê rêsî û di ser seriyê wî re dişimtîne.

- Te çiqas çek li xwe kirine. Şêrîn bi ken dibêjêyê; wê her ku yek datanî û digot ev ê dawiyê ye, yekî din derdiket. Di dawiyê de, ji bilî çovekî di hembêza xwe de nedît.

Ev cara pêşiye ku, ew xwe, bi hev re, tazî dibînin; gewdekî tijî û dagirtî, mina caniya ku nuh dikeve buhara xwe, lê ne yeka siste û textê pişta wê dide xûyan ku, dehên weke wî nikarin axînan jê bînin, lê dema ku ew her memikeke wê dixe destekî xwe û diguvêşe, axîneke zîz ji wê tê û terqîniyeke bilind bi têxt dikeve. Koçer xwe berdide ser sînga wê û dêv dixe qirika beyaz û dimije û hêdî-hêdî ber bi guhê çepê ve dimeşe û çend caran zimên dixe guhê wê ku; bi her carekê re jî kaniyeke kên, di bin nivînan de, derdibe û bi zîzî seriyê wî dixe nav memikên xwe.

Guh berdide û ber bi eniya kal û gewr de diherike û porê wê, hevde bi hevde, bihin dike. Ew ti deveran, ji gewdê Şêrînê, nahêle ku êrîşên xwe najo ser û lê nabe mêvan; çawa ku karikek nuh ji dê bikeve û ew bi zimanê xwe wê ziwa bike, Koçer jî zimanê xwe di ser her pareke gewdê wê re dibe û tîne.

Dema dighe nav rehên wê û dixweze derpiyê çar tilî jê bişimtîne, Şêrîn bi pore wî digre û ber bi sîngê xwe ve dikşîne, careke din, wî dixe hembêza xwe û lingên xwe li yên wî dalîne û heya jê tê Koçer bi xwe ve diguvêşe, dihêle bihna wî bête -birîn. Lê Koçer bê çare namîne, ew careke din û ji destpêkê de, dêst bi lîska xwe ya çûye dike û evê carê bi dizî di nêzîkiya ewê devera bive re dadikeve, heya dighe tiliyên lingê çepê û zimên di nav bera herdu tiliyan re dibe û tîne û ji nuh ve ber bi jor ve hildikşe, lê careke din di rehê rastê re ber bi jêr ve diherike û şopa girîzekî zelqoyî li şûn xwe dihêle.. . Û dema ku ew nêzîkî devera bive dibe, rehên wê bêtir ji hev bi dûr dikevin û bihna buharê dikeve bêvilên wî û ji berî ku, ew titiştî bike, Şêrîn derpiyê xwe dişimtîne û davêje nîvê odê. Heya bi demekê ew xwe, bê deng, di rex hev re dirêj dikin. Koçer dêst davêje beriya çakêt ku, cixareyekê bikşîne, lê xwestina Şêrînê dihêle ew du cixaran bi hev re vêxe û gava ew dikuxe, Koçer cixarê ji dest digre.

- Tu yê bihêlî ku, ew bi me bihesin. Bi gotinê re wê ber bi xwe ve dikşîne û bi gihêştina herdu gewda ji hev re, careke din, gangiliyên sor di canê wan de dipişkuvin... Wê hembêz dike û bi dilovanî ramûsanekê ji nav birihên Şêrînê distîne.

- Koçer.

- Him. Bêyî ku ew seriyê xwe ji nav memikên ewê derîne, deng pê dikeve û gava lêvegerandina wê dereng dimîne, Koçer dipirse: ka wê yê çi bigota.

- Tu ji min hezdikî. Pirsa wê dihêle ew bi lez seriyê xwe hilde û dema li çavên wê dinhêre, şopa giriyekî kevin têde dibîne. Ew xwe hinekî bilind dike û seriyê wê dixe sîngê xwe û heya bi demeke dirêj riwê xwe di nav porê wê de ji bîr dike.

- Eger ku ez hezkirinê zanibim, dê du tişt di jiyana min de hebin; tu û kemanca min, lê nepirs ku ez bêtir ji kê hezdikim. Koçer dixwest hinekî giraniya hêsrên wê sivik bike, lê keçik pirseke din diteqîne.

- Ez a yekê me. Ew dihêle dilê wî bête guvaştin.

- Çawa?! Koçer xwest bireve, lê Şêrînê û her diçû, xelek li dora wî teng dikirin.

- Yeka din di jiyana te de tineye û ji berî ku, tu min nasbikî, te ji kesî heznekiribû. Tu ti caran li ser xwe nepeyiviye. Koçer şopa neynûkên wê di gewdê xwe de dipelîne ku, ew û bi her tîp û gotinekê re, bêtir di termê wî de têne çikandin.

- Tu çima dixwezî rojên çûne bikolî. Koçer dibêje û xwe duqilbîne ser piştê, ew jî seriyê xwe datîne ser sîngê wî û bi hevdeyên sîngê wî re dikeve lîskê.

- Ez dixwezim bêtir nêzîkî te bibim.

- Ne xeme... Tu ne ya pêşî ye ku, ez jê hezdikim; cara pêşî ku min hezkirin naskiribû, min rêza çaran dixwend. Di ewê çaxê de dostekî min ê xwendinê hebû û birayekî wî jî li Libnanê kardikir. Ew hevalê min jî û di rojên havînê de, carna diçû cem wî û di carekê de, ji evan serdanên xwe, wî çend wêneyên keçikan bi xwe re anîn û şanî min kirin, dilê min ji yekê re vebû û bi zor-xatiran min wêneya wê keçikê jê stand. Heya bi çend salan, ew wêne, bi min re ma û ez nizanim çawa û kengî ew, ji min hate dizîn. Lê gûman dikim ku, diya min ji min dizî bû; ew têghêştibû ku hezkirina min a jê re, her diçe, lawiz û jar dibe û hêdî-hêdî vedimre. Min bi awayekî dîntî ji ewê keçikê hezkir, hezkirineke bi hêsir û bi dehê şevan û mîna p.rewekî, min lav û berger jê dikirin ku, ew ji hundirê wêne derkeve û li min bibe mêvan, lê mixabin. Di dû evê hezkirinê re, min pir keçik û pîrek naskirin, lê hertim ew hezkirina min, a pêşîn, dibû bendek di navbera min û ya nuh de.

- Te ew keçik tev, ji bo wêneya kesekê ku, te navê wê jî nizanî çiye, berdidan. Şêrîn bi xeyd dipirse, lê gava bihn germiya wî dipelîne, ew lêvên xwe kez dike. - Ne hertim wilo dibû; pir cara wan ez li şûn xwe dihêştim, eger ku, em wan têkiliyan weke hezkirin bijmêrin û ne weke lêgerîneke li wêneyeke wenda, tevî ku hin caran, keçik haydarî min û hezkirina min a jê re nedibûn jî;- **... Dûmahîk Rûpel: 18**

**ZAROTIYA NEYNIKEKÊ Û TIŞTIN DIN ... Dûmahîk:**

-û tê bîra min ku, nama evînî ya yekemîn, min ji keça xaltiya xwe re bi rê kir û wê jî bi tolazkirinekebilind bersiva min da û hêşt ku ez, heya bi demeke dirêj, newêribim li çavên keçikeke din binirim. Lê piştî ku ez derbasî zanîngehê bûm, kar û barên konevaniyê, em ji jiyanê dizîn û wan karîbû jiyanê, ji me, bidizin.
- Ango, te ji berî min ti pîrekên din nasnekirine. Şêrîn xwe bi gotinê re dixe nav rehên wî û dihêle, careke din, dêwê wî serî hilde û gava dike ku, wê biqulbîne ser piştê, da ku, têkeve ser sînga wê, Şêrîn nahêle û pirsa xwe ya berê dubare dike.
- Belê.. Piştî ku min dev ji karê konevaniyê berda, min pir pûş kutan û ji berî ku, ez bêm û bibim cîranê we, dosteka min hebû.
- Tu hîne wê dibînî. Keçik bi lez dipirse.
- Em ji hev bi dûr ketine; ji roja ku me hevdu windakirî de, min ew nedîtiye. Ev yeka dihêle wêneyên ewê roja ku, Nisrînê jê re gotibû; “Gereke tu çareyekê ji evê çêroka me re bibînî, ev bû çendek tên min dixwezin û ez ji wan re dibêjim; na û vaye bû hefteyek ku, hineke nuh hatine û deng li min kirine û xwediyên min jî li hêviya gotina minin, nema ez dikarim guvaştinên wan hilgirim, a rast rê û derew li ber min neman”, bêne bîra wî û di çavên Koçer de kom ser hev bibin û ewê bihêla lehiya kela wê bi gotina; “Ev cara dawiyê ye ku, emê hevdu bibînin”, birje. Ew û bêyî ku jê bixeyde ji cem bi rê ketibû; ewê rewşa Koçer baş nasdikir ku, ew nikare û nemaze di ewan rojan de, here wê bixweze. Lê tenê dixwest hinekî giraniya li ser dilê xwe sivik bike. Û ew cara dawî bû ku, Nisrînê dibîne, lê ji berî ku ew bi rê keve û weke hemû keçikên evî welatî, ewê jî hemû wêne û nameyên xwe ji Koçer xwestin. Wî dikir ku jê re bibêje: ew rojên ku, me digel hev derbskirine ne tenê para yekiye, ta ku, ew hertiştî ji xwe re bihêle û eger ku, ew karibe wêne û hemû diyariyên xwe yên din jî vegerîne, dê nikaribe bîranînên wî jê bidize. Lê ewî baş dizanî ku, gotinên wî dê li ber dîwaran sêwî bimînin. Tenê du hêsirên ku ji çavên wê hatibûn xwar û li ser masa wî, du golên sipî hêştibûn, ne dixwestin ji jiyana Koçer bar bikin. Gava Şêrînê dît ku, gewdê wî sarbû, wê naskir ku ew bi ramanên xwe re dûr çûye. Seriyê xwe datîne ser sîngê wî û destekî xwe dixe nav por, yê din jî têvedide bin seriyê wî û bê deng lêvên xwe bi ser ên Koçer de dadirvîne û careke din, giyanê bi gewdê wî de berdide. Dema ku wê diqulbîne ser piştê, ew bê berxudan xwe bi dest wî de berdide û Koçer derbasî gulîstana gewdê wê dibe. Cara dudiwan bi derengî diqede û dihêle ew di xwêdanê de bêne şûştin û ji berî ku, ew rabe û biçe mal, Koçer jê dipirse.
- Evên ketine şûna Kalemêr kîne. Pirsa wî ya ji nişka ve, gûman û sawa bûyerine ku, hîne nehatine, di çavên Şêrînê de, derdike.
- Ez nizanim. Bersiveke ziwa dide wî û di cihê xwe de radiweste. - Dema ku wan tiştên xwe anîn, te ew nedîtin.
- Belê. Keçik di kûna çavan re li wî dinire. - Hineke çawa bûn.
- Bi devekî û du guhabûn. Bersiva wê dihêle Koçer bi tijî dengê xwe bikene, lê di cih de jî ew dengê xwe dibire.
- Tu çima bi qehir bersivên min didî, qey tu wan ji berê de nasdikî. Koçer tê derxist ku, ewê bi zikmakiya xwe ya mêyîtî bihna bûyereke pêşerojê kiriye û dike ku, ji nuha ve, rê li pêşiya ewê yekê bibire.
- Na.. . Ew du kesin; Jin-mêrek û zarokek pê re ye. Tu dixwezî hîne titiştî din nas bikî. Koçer wê ber bi xwe ve dikşîne û bi hembêzkirinê re, porê wê li hev dixe. Wî dixwest, hinekî din, li ser ewan kesên ku, nuh bûne cîranên ewan bipirse û nas bike ew pîrekeke çawa ye, lê tirsiya ku Şêrîn bêtir bixeyde. Lew re wî mase da alî, da ku, wê bighîne ber derî, lê ji berî ku, ew derî jê re veke, ewê jê xwest ku, ew vegere nav nivînan, da ku arsimî nekeve û ew bi xwe riya xwe nasdike. Ji berî ku ew ji derî derkeve û piştî ku, hinekî di reşiyê de rawestiya û li hewşê, derî û pencereyên avahiyê nirî; ka bihna payêbûna ti kesî li-wan deran dişope yan na, destê çepê datîne ser lêvan û li şûn xwe ramûsan û Koçerê ku, di nav bîr û ramanan de winda bibû, dihêle. Piştî çûyîna wê bi demekê, Koçer ji bin mitêlan bi dertê, cilên xwe dide hev û laşê xwe dipêçe û dema ku, dibîne hîne lerzandina sermê ji ewî laşî neweşiye, kenzê rêsî jî bi ser de li xwe dike, da ku, here avrêjê û hineke av jî bi xwe re bîne û ew karibe xwe ji gunehan bişo. Bi derketinê re sîka Şêrînê di piş perdê de dibîne.

**- 11 -**

Dîtina pîreka ku, nuh bûye cîrana wan, di roja din de, bi wî dide naskirin ku çima Şêrînê bi diltirsî bersivên wî didan; di çavên evê pîrekê de tiştekî nuh dibîne, tiştek di wan de dibrûse û hestekî biyan bi canê wî de berdide û dihêle bipelîne ku, ew ji berî nuha, di demeke dîtir de, di jiyan û zemîneke din de rastî hevdu hatine, tevî ku baweriyên wî ewqasî bi çêrokên vekoçandinê jî nedihatin. Ew jî û dema ku, dibîne Koçer di derî de radiweste, li cihê xwe dimîne û li wî dimeyzîne. Lê dengê kesê di hudir de dihêle ku, ew nirînên xwe bişkîne û vegere hundir odê. Koçer jî derbasî avrêjê dibe û piştî ku vedigere oda xwe, careke din, çavên wê bi bîr tîne; “ev nirîn û vebirûsa di ewan çavan de, ji min re ne biyanin, min ew ji berî nuha dîtine, lê kengî û li kuderê nema tê bîra min”.
- Koçer.. . Yek ji derve de dêng li wî dike û ji berî ku, ew bibêje keremke, riwê Kamîrên di derî re dertê û dihêle ku, ew xwe ji ser têxt bavêje û ber bi ewî biçe. Gava hevalê xwe hembêz dike, dibîne ku yekî din dikeve derî û bi naskerina ewî re, ya piştî kêliyeke dudiliyê, ka ewe yan na, dihêle bi dilşahiyeke mezin wî hembêz bike.
- Tu çiqas birevî, tuyê nikaribî xwe ji ber me veşêrî. Berhîmê Botanî dibêje Koçer û bêy ku, ew destên xwe ji yên hevdu berdin, heya bi demeke dirêj li çavên hevdu dinirin; ev bûbû çend salên wan in ku, hevdu nedîtine.
- Li ser seran, mal mala we ye. Ew di demeke teng de bi ser wî de hatibûn û Koçer virde-wêde dibeze, da ku, wan cil û firaqên bela–wela kom ser hev ke û cihekî, hinekî, paqij ji wan re bibîne; şeva çûye, ser û binê malê anîbûn xwar. Berhîm xwe dide ser danîştokê û herdu hevalên din jî li ser têxt rûdinin.
- Tu çima bi ser me de nayî û weke ku, ez dizanim, tu ne ji ewên kêm nan-xwê yî, de çima ti kes te nabîne. Berhîm dêng li Koçer dike.
- Ne bes cem te, camêr lingê xwe ji cem tevan biriye. Kamîran jî lê dadigre.
- Çima?! Em bibêjin hûn berê herdu hevalê partiyekê bûn û belkî nelihevkirina îro di warê polîtîkê de hêştiye ku, hinekî ji we dilgiran bibe û neyê cem te, lê ya min çiye. Berhîm dipirse.
- Ji berî hertiştî tu bi xêr hatî, bawerke ku min nebihîstiye tu vegeriye. Di dû xêrhatina ku, ji Berhîm re pêşkêş dike, ew vedigere dostê xwe û bi nîvhenekî dibêje wî: “hele bavê Mediya nizanê ku, ez di çi rewşê re bihorîm û dibihorim, ma tu jî nizanî. Ji berî ku ew gotina xwe bi serî bike, radibe ser xwe.
- Tu yê çibkî. Berhîm dipirse. - Emê qehweyekê vexun, min jî venexwerî. Ew radihêje cezwê qehwê û dema ji derî derdikeve, da ku, ji binmayîn û dûvikên cixaran paqij bike, şopa riwê Şêrînê li ser cama pencerê dibîne û ji berî ku, ew ji xwe bipirse; ka çima neçûye dibistanê, tê bîrê ku îro roja înê ye. Hatina wan û dîtina B. Botanî dihêle ku, ew di ser çend salan re gavke û vegere berî şeş-heft salan; şevên ku, digel kemenceya xwe, li wî dibû mêvan û dihêşt zemîn bi hemû reşî û êşkenciyên wê ve ji bîr bibe. Ew bi awazên xwe ve diçû qatê ezmênê- **... Dûmahîk Rûpel: 19**

**ZAROTIYA NEYNIKEKÊ Û TIŞTIN DIN ... Dûmahîk:**

-heftan û titiştî, ji bilî çavên Medya, nedikarî ewî vegerîne ser riwê zemînê. Lê ewana û ji berê bêtir, ew serxweş dikir û dihêştin ku, ew xwe di wan de ji bîr bike. Di ewan kêlîkan de û bê hest, kemance ji dest wî diket û ber bi ewê diçû, da ku, fincanên qehwê ji dest wê bigre û bi destgirtina jê re rûdêmên Medya aravî dibûn û dihêştin ku, bav wê di bin simbêlên beloq re, bikene. Piştî ku ew vedigere hundir, careke din, dipirse.

- Te negot tu kengî vegeriye.

- Tu nepirsî.. , ev bû sê heyvên min in ku, ez vegerîme, bes mixabin ji dostên weke te re. Erê bîst sal di navbera wan de hebûn û ew di temenê keça wî Medya de bû, lê B. Botanî ew weke dostekî xwe yê pir nêzîk didît û li ser ewê yekê bi wî re dida û distand.

- Te çima cara çûye negot ku, bavê Medya vegeriye. Ew bi lometî ji Kamêrên dipirse.

- Min jî nebihîstibû. Ew hinekî xwe nêzîkî tifekê dike.

- Tu çima derbas nedibû?! Bavê Medya dipirse û dihêle ku, Koçer bi dilekî şikestî bikene; Û ji berî ku, ew sedemên xwe bide xûyan, Berhîm bi wî dide naskirin ku, Kamêrên hemû tişt jê re sayîkirine.

- Vêca naxweze ku, ez ji te re dubare bikim û careke din seriyê te bi çêrokên xwe bêşînim. Ew fincana qehwê di ber wî de datîne.

- Bes û weke ku, Kamêrên ji min re gotiye; ev bû şeş-heft mehên te ne ku, tu derketî. Gotinên ewî dihêlin ku, ew vegere berî anuha bi çend salan; roja ku ew hatin û ew ji zanîngehê birine.

- Tu ne li vir bû û ya din jî, ewana pir tişt di min de kuştin û mîna ew zaroyê ku, nuh çavan li ser jiyanê vedike, min xwast ez hinek bersiv ji jiyana xwe re bibînim. Berhîmê Botanî, yekcar têdighe ku, ewî yekî nuh li ber xwe dibîne; ev ne ew Koçerê ku ji berî çend salan didît e, bi carekê ew hatiye guhartin, ji rûniştina ku xwe komî ser hev dike de bigre, mîna ku hertim cihê wî tengbe yan jî tirsa wî ji lêdana panekê di nav çavên ewî de, hebe û ew bixweze xwe di koşeyekê de veşêre, heya bigihe canê wî yê mirî û dema jê dixweze ku, ew hinekî li ser rojên xwe yên ku, di zindanê de mabû bi axife, Koçer bi lavêj dibêjêyê:

- Eger ku tu xûrijî nebî, min ji bersivê biborîne, bi kêmayî di dema anuha de. Di ewê hîngê de çavên wî bi destê Koçer dikevin û dibîne ku, ewî du tiliyên xwe winda kirine. Ji bilî kişandina neynûkan ku, li şûna wan hestiyê reş û şikestî şîn bûbû, ewî du tilî jî wenda kiribûn. Ev dîtina nuh dihêle ku, ew hûrnirîneké li gewdê wî bike û pir guhartin, birîn, şewitandin û şikestinan di laşê wî de bibîne.

- Tu gelekî li ba wan ma. Pirsa wî dihêle ku, ew careke din û bi rûkenî di gotina; "li ba wan", bi rame û ji xwe dipirsa: ka nêzîkbûna evê pirsê ji ya ku, yek ji dostekî xwe bipirse; tu çiqasî li cem yara xwe ma û rewşa ku, ewana di zindanê derbasdikir, heye. - Sê salan û tiştekî.

- Negotin te tu çima girtine û tu li ser çi bingehê berdan. Ev cara dudiyê bû ku, ev pirs jê tête kirin, cara pêşî dema ku, hevalê wî yê berpirsyar û di gel du hevalên din hatin serdana wî, ev pirs jê kirin û ewê hîngê Koçer gûmankir ku, ew ji omînekirinê hatine û gûmaniyeke beloq di çavên wan de dibîne. Lê û li gor bizavên wî bi partiyan re, ew tiştekî normal bû; hêzên asayêşê û ji zû de, ew hest û bawerî li ba wan çandibû; ku her yek bête girtin û piştî demekê, eger çiqws dirêj be jî,were berdan tenê meremekê ewê yekê heye, ku ewî camêrî, ji wan re, gotiye: "erê". Helbet damarên evê baweriyê jî hebûn, li gor bizavên wan bi evê dezgehê re ku, ewê di destê wan keve, ji bilî gorê, ti kes nikare ewî ji dest wan derîne ya jî dive ji wan re bibêje; "erê".

- Ez dibêjim: wan nexwest filîmê kelê û careke din, vegerînin. - Teviza ku di zarava Koçer de, dihêle dilê bavê Medya bête guvaştin û di ewê hîngê de çavên wî bi kemenca bi dardakirî dikevin, ew radibe û wê datîne; toz bi sê-çar tilîyan bi ser ketiye û dema ku, dixweze li sazxe, têleke din diqete û ew dihêle bi çavekî xemgîn li wî binêre û di vir de ew baş têdighe ku, evê li pêş wî rûniştiye, netenê dixweze ji dora xwe bi dûrkeve, lê ew ji xwe û jiyana xwe ya berê jî direve.

Berhîmê Botanî digel kemanca mirî vedigere cihê xwe û ji berî ku, ew babeteke nuh veke Koçer jê dipirse; ka wî jiyana ewropa çawa dît. Û bi evê yekê re, wî hin derî li ser ewê mijarê girtin û deriyê mijareke dûdirêj, yeke bê êş û kişandina neynûkan, vekir û demeke dirêj pê borandin û ji berî ku, ew ji cem wî bi rêkevin, Berhîmê Botanî di devê derî de radiweste û bêy ku, destê wî ji yê xwe berde, bi sûndkirin dide; ku ew bê serdana wî û evê tenahîtiya xwe bişkîne.

**- 12 -**

Piştî ku ew diçin, Koçer dixweze hinekî oda xwe bide hev, lê gava ewê qîretê di xwe de nabîne, dêv ji çêrokê berdide û bi ser de jî, ewan pirsên Berhîm ew pûçkiribû û pir derî li wî vekirin. Ev bûbû çend heyvên wî û her ku, rojeke din diborî ewî dîwarekî din li dora ewan dem û çêrokan bilind dikir. Heya xwe gihandibû ewê baweriyê ku, ew ti caran nehatiye girtin; ew dem ji jiyana xwe avêtibû. Lê vaye yekî ku, ne di bala wî de, dikare hemû dîwarên wî yên xwêyî biherifîne û careke din kaniyên şor derbibin.

Di ewê rojê de û ji berî ku, ew bên û wî bibin jî, ewî bihneke nexweş; bihneke miriyan di bêvilên xwe de dipeland û ew yeka vegerand ser nesaxiya bêrîkên pozê xwe. Lê tevî ewê yekê jî, hesteke veşartî di kûraniya mejiyê wî de dilivî ku, dê bi ser çêrokeke ne normal vebe. Di ewê kêlîka ku seriyê wan dibîne, tirkinî bi dilê wî dikeve; erê titiştî xasma ku, di wan de be û bala yekî bikşîne ser, nedît. Lê tenê ew nirîna wan hêşt ku, gavên Koçer giran bibin û bihêle hevalên wî jê derbas bibin, tevî ku, çendekan jî destên xwe li milên wî xistin; ka çima ew di devê derî de rawestiye û rê li derketina wan teng kiriye, lê bêyî ku li wan vegere di cihê xwe de tête mêxkirin û dema ku, bi tena xwe di hundirê holê de dimîne, ew herdu camêr û ji cihê ku, lê rawestiya bûn ber bi wî ve tên û her yek destekî xwe di yê wî re dike û weke ku, ew nikaribe li ser lingên xwe venîştî bimîne, ewî hêdî-hêdî didin nav xwe û ji dergehê zanîngehê dertînin.

Tenê û piştî ku, ew di cîbê de bi cih dibin, bi zimanekî kulavî dipirse: "hûnê min bi kuve bibin". Lê weke ku, ew bi tena xwe rûniştibe, deng bi kesî nakeve û yek bê ji ber xwe berdide û bihneke nexweş li hundirê cîbê belav dibe.

- "Rojên xweş di sibê re bêline". Koçer û piştî ku, ew bi panekê re xistibûn hundir cîbê, gotibû xwe. Lê ewî nedizanî dê bihêlin ku, ew rengê rojan jî ji bîr bike; camêran û heya ewî dighînin ber dergehê avahiyeke bilind, têra xwe li wî didin, ne digotin ev der bive ye û eger çi di destê wan de ba jî nedêvşand û bi pana dawiyê re, weke ku, çawa li cîbê siwar kiribûn, têwer dikin. Ji berî ku bighe û karibe tozê ji xwe dawşîne, panake din li deriyê kûna wî dikeve û bi xêra ewê ku, bi kepira wî digre, ew bi devgeza naçe qîrê.

Koçer pir caran, weke hemû bajariyên xwe, bi ustûxûzî di pêşiya evê avahiyê re borîbû; tirs û sawa wê nedihêşt ku, ti kes seriyê xwe li ber hilde û ti kesî jî nedikarî, bi baweriyeke rasteqînî hejmarên qatê wê bibêje.

Ew çend gavan di hewşê de davêjin, Koçer ber bi ewan gul û qurnefîlên sor ve dinire û bi riwekî sar berkenî dibe. Deriyê pola vedibe û ewî têwer dikin, bi çend gaza û weke gokê zarokan di ser pêpelokên wê zêrzemiyê re tol dibe û li bin pileyadawî radiweste. Ewana û her ku, yekî nuh tanîn, ev nişkabûna han pê re çêdikirin;- **... Dûmahîk Rûpel: 20**

**ZAROTIYA NEYNIKEKÊ Û TIŞTIN DIN ... Dûmahîk:**

-dihêştin ew bi serbestî gava xwe bavêje û bi ewê têvedana xurt re û bê dîtina titiştî di bin lingên xwe de, dihêştin ew li dawiya pileyan û dev bi xwîn, xwe bibîne û çend diranan jî ji devê xwe velûke. Evê yekê dihêşt ew hinekî bikenin û jiyana xwe ya ziwa, heya bi demekê, ji bîr bikin.

Koçer ewan çend perçîmên diranan û bi xwîna ku, ji çend deveran derdibû re, velûdike û ew hîne li ser lingên xwe ranewestibû û careke din, ew herduyên ku pê re, wî didin nav xwe û bi teqandina kulmekê re, êşeke tûj di nava wî ya zirav de derdibe, lê rê nekete wî ku ew xwe bi ser xwe de kilor bike; reşiya ewê derê û kulemistên wan li ser pişta wî bibûn yek û rê nedikete wî ku, karibe xwe ji wan bibparêze.

Piştî pir êş û lêdanan, ewî dixin odeyekê û derî li ser digrin. Heya bi demeke dirêj, ew bê liv, di cihê xwe de dimîne û bizava berî kêlîkê bi bîr tîne, lewre û ji berî ku, ti gavên din bavêje, di cihê xwe de direwise û bîranîneke kevin ku, carekê dostekî wî gotibûyê: “di hundirê her odeyeke zîndanekê de, çalên pîsîtiyê hene û eger ku, yek hajî xwe neke û di her kêlîkê de, ewê di nav ewê pîsîtiyê û cerdûnan wer bibe”, bi bîr tîne. Evê yekê hêştibû ew di cihê xwe de vemre û nemaze dema ku, bihna pîsîtiyê bêvilên wî dadigre û dihêle baweriya wî bi evê yekê kûrtir bibe.

Lê piştî ku hînî reşiya ewê derê dibe, têderdixe ku ne tenê ew di jorî çaleke pîsiyê re rawestiye, lê ewî bi xwe di hundirê çalê de ye û ava qirêj heya bi jorî gûzika wî bilind bûye û tenê êşa di gewdê wî de nehêştibû ku, ew bi ewê yekê hest bibe.

Cihê ku ew xistibûnê de, gazek bi gazekê ye û ti kes nizane ku, pêsiya vir ji kengî de ye û ya çiqas kes û ode li ser hevdu kombûye.

Ev cara pêşî bû ku, kela verîşiyê evqasî bi hêz tête wî, lê Koçer heya û heya jê tê xwe digre, da ku, zikê wî vala nebe; tikes nizane dê heya kengî birçî bihêlin û nedixwest zû-zû û di roja pêşî de, ji bo pariyê nên, xwe li ber wan deyne. Lê hinava wî dikele û her ku, cardûnekî ji derlingê pantronê xwe davêje, tiştê ku ji berî salekê xwarî jî di dêv re çedike, tu dibêjî qey avêtina cerdûnan û verîşiya wî bi hev re ketine cirîdê, di kêmî katekê de, ti der nehêştin ku bi verişiya xwe riswatir nekirin û piştî ku titişt di hundirê xwe de nehêşt, kabokên wî sist dibin.

Dîwarê hemberî xwe hembêz dike û gava derzandina ku, bi ber laşê wî kiribû zêdetir dibe, ew tê derdixe dê piştî kêlîkeke din bêhiş bikeve nav ewê qirêjiyê.

Naskirina evê yekê dihêle dilê wî bêtir lêde, lê tevî evê zanîna xwe jî, ew li ber xwe û Xwedê digere, da ku, ew pêlên bêhişiyê di ser wî re bişon û wî ji bizava têwerbûna çalên avrêjan biparêzin. Lê xwêdaneke sar bi laşê wî digre û her dice derzandina laş kûrtir dibe, reşiya hundir jî bêtir tîr dibe û bi zor-zor ew dikare bihna xwe derîne. Pir naçe û dengê şerpîniyeke bilind bi hundirê wir dikeve û jîndarên tariyê ji xew şiyar dibin.

Serleşker ji xewa dana şiyar dibe û piştî pir gotin û xeberan; bêyî ku xwestekawî, ji evê yekê, kulandina berdestên xwe be, ew piyaleke qehwe dixweze û ordiyeke leşker bi ser ewê ku, nuh milgirtî de dişîne. Bi vekirina derî û qîrîna wan bi ser de, ew çavan vedike; xwe di nav golên pîsîtiyê û verîşiyê de dibîne û di asoyê nirîna wî de, pozê çend solên leşkerî dibirûsin. Serî hîne girane, wêneya wan solan hin caran winda dibe, lê sîtila ava qeşagirtî dihêle birûskeke tûj, laşê wî, bihejîne û careke din xeleka solan li dora wî bigere.

Piştî pir bizavan ew li ser xwe rûdine û bi zor-zor, seriyê ku bi ser sîng de qulibûbû hildide û li riwê wan dinire, pir naçe û yek bi temriya wî digre û bi tijiya dêv tifî ser riwê wî dike û gava ku, ew tif bi ser riwê wî de diherike, careke din, bulqiniya verîşiyê bi wî dikeve û çend solan di bin lehiya xwe de dihêle, pêre jî-hin pan li nav riwê wî dikevin; “lawê dêlan, te sola min weke riwê xwe gemirand”. Bi gotinê re sîtileka ava din lêdibe û dihêle diran li ser hev ranewestin. Erê heyama derve hinekî sar bû, lê ne bi bêtara evê derê.

Careke din wî bi tenê û bê hiş dihêlin û gava ew şiyar dibe û xwe di nav golên pîsîtiyê û verîşiyê de dibîne, bizavên xwe dike, da ku xwe bighîne ewê qunciké hinekî ziwa. Bi gihêştina wir re û darvandina ava ku, ji wî diherikî, ew der jî weke hemû deverên din digemire, lê dîsa jî ji nîvê golê çêtir bû. Ew xwe di ewê quncî de kom ser hev dike û eger ku, ji ewî bihata dê pê û destên xwe daqirtandana û xwe di quleke mişkan de veşarta, hin bizavên xwe kirin jî, lê ew têde bi ser neket; “ev ne bû çend katên min in ku, ez li virim û ez xistim evê rewşê, eger ku bi dirêjî bide dê çawa bibe”. Ji xwe dipirse û bi ramanên xwe ve dûr diçe û pir çêrok, ji yên hevalên ku ji berî wî hatibûn evan deran û pozbilindiya wan di demên ku, bizavên xwe yên zîndanê tanîn zimên, bi bîr tîne.

Dengê derî, wî ji çêrok û bîranînên dûr verdigerîne û çavên wî li ser rastiyên evê deverê vedike. Li ewê ku di derî de rawestiye dinire û têderdixe ku, dudiyên weke wî dê jê çêbibin; simbêlên reş û stûr dêv vedişêrin û dema çavên wî bi şopa ewê birîna kevin ku, di riwê ewî kesê di devê derî de rawestibû, dikevin ew dibêje xwe; “mirov û hîne di zarotiya xwe de, riya jiyana xwe dipejirîne”. Rawestina wî, ya di derî de, pir dirêj nake û ew bi tijî devê xwe dikene. Kenê wî Pir naçe, ji nişkave dibire û tif ser riwê wî dike. Helbet rewşa ku ew têde û komên pîsîtî û qirêjiyê, yek ber bi ewê yekê têve didan; wan hin caran bê hemdî xwe tife ser wî dikirin.

- Te cewrikî diya xwe di bin kê de hêştî û tu hatî xwe di evê pîsîtiyê de digevizînî. Ew jî panekê bi wî vedide û dihêle qîrîneke kûr bi wî keve, bi pana dudiwan re reqiniyê bi seriyê wî dixe û pêre jî derî li ser digre. Demeke dirêj û giran diçe heya ku, ew xwe ji nuh ve kom ser hev dike û weke berê xwe bi ser hevde diguvêşe û di kêlîka ku, heşê wî sayî dibe, ew bizavên xwe dike ku, karibe hin tiştan ji hev derxe, lê deziyê ramanan zû-zû diqete; “ev çi ji min dixwezin.. çima napirsin, napeyvin û..”. Zincîrên pirsan di seriyê wî de der dibin. Di ewê hîngê de çavên xwe li odê digerîne; ji bilî danîştokekê, di wir de, nabîne û gava bi hesinê wê yê cemidî digre tiliyên wî dişewitin. Eger ku kizotên êgir xistibana kefa destê wî dê ewqasî şewat bi laşê wî de bernedana, bi evê yekê re hişê wî şiyar dibe û têderdixe ku, cihê wî hatiye guhartin, bêyî ku bê bîrê kengî û çawa. Tenê bihna kefnikê û piştî ku, çend pişk ji wî berdan, hêştibû bi guhartina cih hest bibe, lê piştî kurtedemekê ew guh nade evê guhartinê jî û bi çavdêriyeke, bê-alî mîna yên kemîrê, li dora xwe dinire.

Odeyeke pan û rûte; dîwarên wê û di hin cihan de, bi lekeyên xwînê xemilandine. Nêzîkî seriyê xwe lekeyeke xwînê ya teze dibîne, bi tirs û dizî, weke ku yek nexwaze wê şiyar bike, tiliya xwe ber bi wê dirêj dike. Erê qeymêq di ser re girtibû, lê bi guvaştina ewê re, xwîn di du-sê çavan re davêje. Evan lekeyên xwînê û perçeyên eyêr ên ku, bi dîwêr ve, hinekî hovîtiya evê odê kokiribûn. Ew ji nuh ve vedigere lekeya nêzîkî seriyê xwe û bi xwediyê ewê dirame; “ew nekesekî dirêje, ew di dirêjiya min de ye û li gor evê yekê ew jî, weke min, rûniştibû dema ku seriyê wî bi dîwêr vedidan”.

Ew careke din tiliya xwe di ser ewê lekê re dixuşîne û di devereke qalind de, tiliyên wî sor dibin û dema wan bihin dike, têderdixe ku xwediyê wê mîna wî, sîh û pênc sal derbas nekirine û dibêje xwe: “wî jî weke min cixare vedixwarin” û bi dîtina tifeke kesk- ... Dûmahîk Rûpel: 21

**ZAROTIYA NEYNIKEKÊ Û TIŞTIN DIN ... Dûmahîk:**

-re jî dinase ku, xwediyê lekê û eynî weke wî bi êşa zirave û wî jî demeke dirêj, di bin-erd û zêrzemiyan de, jiyana xwe borandî. Wî dixwest hîne lêkolînên xwe li ser cih û jîndarên wir bidomîne, lê vekirina derî û derbasbûna wan sê kesan, dihêlin ramanên wî birevin û ew, bê hemdî xwe, herdu destên xwe dide pêşiya riwê xwe û xwe kom ser hev dike; da ku, karibe xwe ji panên wan biparêze. Bi danîna destan li ser seriyê xwe, ew dinase ku, seriyê wî mîna kelekekî hatiye pelixandin û di çend deveran de, dipelîne ku perçeyên eyêr tevî porê wî hatiye rêşkirin û xwîn di çend golekan de meyî ye.

Dema bê dengiya wan dirêj dike, ewê hîngê ew çavan ji erdê hildide, solên wan jî reşin û ew dibirûsin, di îva pantironê wan re ber bi jor ve hildikşe, dighe nîvê wan; yekî ji ewana dest xistî bêrîka xwe û mîna ku, ewî tiştek di wir de girtibe, ew der werimandiye.

Sê tore ne û ewê di ortê de hinekî kintirî herduyên dine, lê ew jî du caran li wî heye. Dema li çavên wan dinire, nirîneke sar û bê wate di wan de dibîne, lê qirêjî û bihna ku, ji wî hildikele û badana riwê wan hêştibû ku, ew hinekî dilê xwe hûnik bike; “bi kêmayî ewê min heya bi demeke dîtir bihêlin, da ku, ez xwe paqij dikim”. Hevoka dawî dihêle ew berkenî bibe, lê nîşana ew kesê ku di ortê de rawestibû, berkeniya wî vedimrîne.

Ew bê peyvîn şanî wan dike ku, rê ji wan re vekiriye; mîna ku cewrikekî ji nav sêrgo derxin, wilo radihêjin wî û deriyekî nuh vedikin, cara pêşî bû ku çavên wî pê dikievin û ew dikevin odeyeke nuh ku, ji ya berê firehtire. Wî ber bi banyowê avê dikşînin, bê dil cilên wî jê dikin û wî jî davêjin nav avê. Dema ku jê dertînin û ew xwe weke çelemekî sor û tazî dibîne, bi lez, her destekî xwe datîne ser cihê yek şermiyê û ev şermiya wî dihêle ew têra xwe bikenin, lê pir naçe û ji nuh ve radihêjin wî û davêjin ser ewê cilika ku, xistibûn quncekî odê.

Gava ku ew dibîne, wan jî dest avêtin cilê xwe û ji xwe datînin, ew û bê hemdî xwe çend caran dibêje; “na, na.. naaaa”; ewî berê pir çêrok li ser evê yekê bihîstibûn, lê qet nedikarî pê biramiya ku, ew jî yê rojekê di ewê bizavê re derbas bibe. Nayên wî, di bin kenê wan de, digevizin û ew li ser pişta wî dibin girek; sîxeke êgir di pişta wî re dimeşe û ewê piştî demeke dûdirêj çavan veke, lê dê têdernexe ka çi û çiqwas di ser ewî re borîne û heya bi demekê titiştî nabîne û nejî dizanê ew li ku derê ye.

Piştî demeke dirêj û gava çavên wî bi wêneyê serok yê serkêl û dev li ken dikeve. Ew bi rengekî vizînî hin dikene û hin jî digrî û ev rewşa heya bi demekê bi wî re dajo. Piştî ku kenê wî ziwa dibe û di dû pir bizavan re, da ku, li ser xwe rûne, goleke xwîn di bin xwe de dibîne.

Ew hîne tazî bû û destê çepê bi wî ve li ba dibû, tayeke xwêdana sar bi laşê wî ve digre û heya ku, ew cilên xwe li xwe dike, çend caran, bê hiş dikeve û cara dawî dirêj dike. Gava ku ew li ser hinek deng şiyar dibe, xwe ji nuh ve di çala avrêjê de dibîne û di ewê kêlîkê de jî, kuleka di derî de vedibe û ji piş ve kesek nanekê davêje ser çavên wî, lê ji berî ku ew zanibe çi çêbû, dibîne ku nana firoke di nîvê pîsîtiyê wer dibe û çend cerdûn bi hev re êrîşî ser dikin. Erê ew dengê rûvikên xwe dike, lê dîtina nana di nîvê golê de û êrîşiya ewan cerdûnan û girtina wan jê re, dihêlin ew bighe ewê baweriyê; eger ku heyveke din jî nexe, dê ti carî destên xwe navêje pariyê di nav pîsiyê de. Lê piştî çend katan ew li şûna wan digere, ka ti pariyên nên li şûn xwe nehêştine û filîmê ”Ronahiya Bajêr”, tê bîra wî û ew dikene û dikene.

Ew heya bi demekê xwe digre, lê piştî wê hew dikare xwe li ser lingan bigre û destan ji ber xwe berdide. Dema ku derî li ser wî vedibe û hineke ronahî dikeve hundir, ew li xwe dinire û gava yekî din di xwe de dibîne, bê deng dibêje xwe: “nayê-bawerkirin ku, ez di navbera roj û şevekê de evqasî bême guhartin... Tu dibêjî qey min porê xwe bi bênîşt hûnandî û ma ev cilên min, ji roja-roj de, cilşo nedîtine û bi min ve hatine şimakirin”.

- Rabe ser xwe. Lê ji berî xwesteka xwe jî, ewî panek pêvedabû û hêştibû ew mîna singekî di quncikê dûrtir de bête venîştin. Piştî ku ew navê wî nasdike, careke din, derî di riwê wî de digre û dihêle ew ji xwe bipirse: “çima wî jî ez bi xwe re nebirim û..”. Gava çûna oda duh tê bîrê, dilopeke xwîn dadirive ser sipîka çav û bê hiş dikeve.

Nêzîkî rojekê ew wilo bê deng dimîne û li ser êşeke tûj radibe; ku çend cerdûnan êrîşî laşê wî kirine û di hin cihan de ew bi birîn kirine. Di ewê gavê de kuleka derî girtîbû û tenê ew hêvî di dilê wî de derdibe ku, careke din vebe û ewê evê carê nehêlibe ev cerdûnên hov pariyê wî birevînin.

Ev hêvî piştî demeke dirêj bi cih tê û eynî ew kesê duh nanekê davêje nav çavên wî, lê ji berî ku ew bikeve û di nav ava kevizgirtî wer bibe, ewê li banî digre û bi çavne sor li cerdûnan dinire û bêyî ku, guh bide kêza-kêza wan, nên dixe nav diranan. Lê êşeke kûr di wan de der dibe û dema ku, nên derdixe dibîne ku ewê di xwînê de maye. Bi zorê dikare pariyekî jê bişkîne û piştî ku, demeke dirêj di dêv de dihêle, da ku, nerim bibe, dikare daqurtîne û bi wê şêweyê û pişt çendekî, ew dawiyê li nana xwe tîne, lê çiyayekî ji xwê di hundirê wî de bilind dibe.

Birçîbûna hov nehêştibû ew nasbike ku, ewî çend kîloyên xwêyê bi ewê nanê re daqirtandibûn, lê piştî ku devê wî ji girîz ziwa dibe tê der dixe ku çima, di cara çûyî de û her ku cardûnan pariyek dişkandin, carekê seriyê xwe dixistin nav ava çalê û kulmeke av dadiqurtandin. Di ewê çaxê de ewî kenê xwe bi wan kir û gote xwe: “heya bighe cerdûnên evê derê ne wek yên derve ne”. Û dema evê yekê bi bîr dixe û têdighe ku tenê dikare bi ewê riyê tihin û ziwabûna hundirê xwe vemrîne, careke din, kela verîşiyê bilind dibe. Lê ji berî ku, di devê wî re dakeve, ew devê xwe dixe goleke çalê, lê ew ziwabûna hezarê salan venamre.

Demeke dijwar di ser re dibore û gava ku, ti kes bi ser ewî nakeve, hêza ku di laş de mabû kom serhev dike û çend kulemistan di derî de diteqîne.

- Ez tîme. Bi vekirina derî re dibêje ewê ku, di derî de radiweste.

- Lawê dêlan, qey ez li ber destên te danîme.

- Ez tîme. Bêyî ku ew guh bide gotinên nûbedar û zanibe ka ew çima û ji çi xeyidî ye, xwesteka xwe dubare dike û dema ew kes tif ser riwê wî dike, eniya wî weke her car naqujmire û nejî kela verîşiyê bi wî digre. Girîzê ser riwê wî jî hêdîhêdî dadikeve û dema ku, dadirive ser lêvên wî, ew zimanê kulavî dirêj dike û lêvên xwe dalêse; belkî ew hinekî ziwabûna salan vemrîne.

Dema yê nûbedar dixweze ji nuh ve kuleka derî bigre, ew destê xwe dide ber û her çar tiliyên wî dikevin nav bera herdu keviyên hesin û bi kişandina wan re du tiliyên xwe winda dike û nîvê goşt bi kulekê ve dimîne. Lê êşa wan jî nikaribû bihêlin ku, ewê tîhbûna tîr ji bîr bike.

Dengê qîrîna wî dûr çûbû û ji berî ku, ew karibe dengekî din derîne, xwe li ser textekî leşkerî dibîne û dinire ku, şaşeke sipî tiliyên wî vedişêre û bi xuşandina destê din di ser riwê xwe re, ew dinase ku, pir roj di ser binçavkirina wî re derbas nebûne. Lê ew êşa di dêst de dihêşt bê tebat raweste û dema lê dinire, dibîne ku ew heya bi enîşkê reş bûye û mîna stûnekî werimiye. Jana dijwar dihêşt ku, ew hesinê sar têxe nav diranan û gezke.. . Dengê nalîneke sar dikeve odê, ev cara pêşî bû ku ew dinale.

Demeke din a dirêj di ser wî re diçe û ti kes bi ser de nayên û gava dixweze zanibe dem li çiye,- **... Dûmahîk** **Rûpel: 22**

## ZAROTIYA NEYNIKEKÊ Û TIŞTIN DIN ... Dûmahîk:

-tê bîrê ku, di kêlîka ew xistin avrêjê de, hemû tiştên wî jê standin. Heya benikê solên wî vekirin û bi tinazî gotinê: “da ku tu xwe, bi wan, bidarvenekî”. Ewê hîngê ew tênegihêşt ka çima ew ditirsin ku, ew xwe bidarveke, lê piştî çend katan bi wan re, naskir ku camêr dizanin çi dikin û tirsa wan di cihê xwe de ye û wilo ewê riyê jî li pêş ewê milgirtî dibirin.
Xwe kom serhev dike; êşa dêst dijware, dirêj, ser hesinê têxt dike, hinek hûnikî pêde têberdan, lê heya bighe damarên porê seriyê wî têşin. Bi vekirina derî re, ew bêtir xwe bi serhev de diguvêşe û weke careke çûyî, dike ku xwe di koşeyeke text de winda bike. Lê ew kesê ku, derbasî odê bûbû û mîna ku, hay ji wî tinebe, ew ber bi koşeya ku, ewî xwe têde kom serhev kiribû tê û di jorî têxt de radiweste; zerika şorbenîskê digel nanekê davêje ser masa di nik têxt de û bêyî ku ew li wî binire ji odê dertê. Ketin û derketina ewî kesî û bi rengê çûyî hêştibû hestekî tenik li ba wî çêbibe û ne dizanî ev yeka ji akama liv û xwîna ewî kesî bû yan jî ji anîna xwarinê bû. Lê tenê û eger ku, wî carekê lê nirîba û destê xwe di ser seriyê wî re xuşandiba, dê bihêşta ku ew dûvê xwe derîne û hinekî ji wî re bihejîne û hemû tiştî ji bîr bike.
Ew nên dike parî-parî û davêje nav şorbê û piştî ku, ew nerm dibin bi destê ku, sax mabû, têvedide dêv û ava ku di zerkê de mabû jî bi ser xwe de dike û dilê wî çayekê dixweze. Ev cara yekê ye ku, bi vî awayî, çayê bi bîr tê û ta ku, karibe ewê xwestekê ji bîr bike, ew çavan li odê digerîne; her çar dîwar û heya bana wê jî, bê şopa yên ku ji berî wî di wir re derbasbûne, nemane û careke din, di jorî seriyê xwe de, çerm û porê seriyekî ku bi dîwêr ve mane, dibîne.
Lê di kêlîka ku, ronahiya lempê li odê belav dibe, ji nişkave û bê hemdî wî, qijîniyek bi wî dikeve û ew weke dînan çavan li dora xwe digerîne; lekên xwînê, eyar û porê seriyan li her deverekê belavin. Ewana ti der nehêştine ku, bi golekên xwînê nepêçane. Ev yeka dihêle ew bi lez çavan bigre, lê wêneya odê ne tenê di çavan de hatibû çikandin, ew heya bi kûraniya mejî jî çûbû û di wir de meyî bû.
Gava çavan vedike û li banê odê dinire dibîne ku, çilpikên xwînê ji wir jî dadirivin û çêroka gundiyê wî ku, keçika xwe bi çovê şivantiyê kuştibû, tete bîra wî.
Ew bi xwediyên evan şopan dirame; “ka ew çi kes bûn, hevalê kîjan partiyê bûn. Ma ew hîne dijîn an hatine kuştin û çima. Ka ewana çi dixwest û çi kiribûn, da ku, evqas êşkenc, bi wan kirine; ma ka min çi kirî û çi ji min dixwezin. Hema êşkencî ji bo êşkinciyê û ne tiştekî din, xweska ji bo kêfxweşiya xwe wilo bikirana”. Pirsên çûyî çavên wî li ser rewş û dawiyên tenêtiyê vedikin.
Ji nuh ve çavan dide hev, dûr diçe û pir qonax û deman dişkîne. Li bajarê Birlînê xwendina xwe ya mîzîkê kuta dike û pirojeya wî ya ku pê diblomê distîne, li ser destaneke kurd bû. Piştî ku ew destana Eyşa Îbê dixe kirasê opêra û wê li ser şanogeha amojgehê pêşkêş dike, rexnevanên Alman ewê weke dibistaneke nuh di mûzîka welatê xwe de dinirxînin û hemû îzgeh, tilvizyon û rojname li ser dipeyvin, ew di navbera roj û şevekê de dibe xwedî nav û deng û hemû dezgehên aguhdariyê didin dû wî. Ew jî tevî koma Alman a niştimanî li kolanên bajarên Eowrûpa digerin û her diçe navê wî mezintir dibe.
Piştî çend salan û çend karên mûzîkê yên mezin di warê tore û kelepûra kurd de û alîkariya hin xêrxwazan, rêjîma welêt razî dibe ku, ew jî bên û di mehrecanê Bosre de pişikdar bibin, lê bi navê dewleta Alman û gereke ew, ewê hevoka ku bi kurdî li ser kerta danesîna wan hatiye nivîsandin, rakin û ew bi çi zimanî opera xwe pêşkêş dikin ne xeme, lê tenê çênabe ku bi kurdî be. Ew deh salên wî bûn ku, dûrî welêt ketibû û îro ew,-
-di gel koma orkêstira ya ku, pêre bajarên Ewrûpa tev vekiribûn, vedigere welêt. Û ji berî ku, ew ji deriyê balefirê derkeve, mezovana herî xweşik çavekî ji wî re dadimrîne û dihêle, ew keçikên gundê xwe bi bîr bîne ku, bi damrandina çavekî ji wan re, çawa riwê wan aravî dibû û ew direviyan piş sincan. Dengê polîs wî ji ewan xewnerojan şiyar dike û dinire ku, ew li hêviya pasporta wî rawestiye.
Demeke dirêj diçe, tevî ku nûnerê wezareta rewşenbîriyê bizavên xwe dike ku, endamên komê bighîne ewê baweriyê ku, ew derkevin hotêlê û ewê kar û bizavên xwe bi polîsan û asayêşan re bike, da ku, pasporta wî ji nav lepên wan derîne û ewê bi hev re bidin dû wan, lê dîsa jî ti kes ji wir nalivî û hinek ji wan seriyên xwe datînin ser çenteyan û hesabê xwe û xewê dikin. Derengî şevê du kes ber bi ewan tên û bêyî ku, ew guh bidin an jî zanibin evên Alman çi ji wan dixwezin, ewî didin ber xwe û di deriyekî reş re dadixin qatên bin erdê. Bi vekirina derî re ew tê avêtin û avêtin... Ji ser têxt radibe û kûr li çavên wê dinire; zarotiya xwe û lîskên di piş mêwên tirî de, di wan de, dibîne. dema ku, pîreka nuh bibû cîrana wan dibîne, Koçer weke bodelakî di pêşiya wê de radiweste û bi devekî ji hevkirî li wê dinire, bi pirqîniyeke ne li bîr, wî şiyar dike û ji xewnerojan vedigerîne. Kenê wê dihêle çilpikeke xwêdanê di piş guhê wî de derbibe û .. rê ji wê re vedike, da ku, derbsî odê be.

- 13 -

Pîreka rûşuştî û weke ku, li mala xwe be, bi derdora xwe re dide û distîne; ewan çend cilên ku, li ser têxt bela-wela kirî, dide hev û şûna rûniştina xwe dûz dike, lê ji berî ku ew rûne jî û hîne wê ew der didan hev, çend caran bi kûna çavan li xwediyê odê dinire û bi dengekî bilind û weke ku, nasbûneke kevin di navbera ewan de hebe, dibêjêyê: “hûn çima evqasî hej gemarê dikin, ezê bi ewa derdî biçim û rastî m.rekî paqij neyêm”. Koçer gotinên wê tenê bi merema aşkere û serast, şirove dike û dûrbûna dudiwan nadêyê.
- Çima tu narûnî. Bi gotina xwe re, ew dêst davêje sîngê xwe û pakêtê jê dertîne, bi berdana dûyê cixarê re, careke din, deng li wî dike: Tu niha ji xwe dipirsî ev çi jineke rûşûştiye û te hezar hizir di seriyê xwe de gerandin. Erê ewê ramanên wî xwendibûn û tevî ku, ew xistibû bin akama zîrekiya xwe, lê dîsa jî û piştî kêlîka naskirinê, Koçer aramiya xwe vegerand û ew tê di hember wê de rûdine.
- Ez ji te venaşêrim ku, heya bi kêlîkê, te hêşt ez pûç bibim û belkî ew ne sûcêmine; di civaka me de, eger ku mêrek, bi rengê ku tu ketî hundir, derbas cem me bibe dê bihêle yek şerpeze bibe û ne hîne pîrekek û nemaze yeke di xweşikbûn ûciwantiya te de. Wî xefka pêşiyê li ber lingan veda, lê nêçîra nuh xwedî bizave ûKoçer ev yeka di nirîna wê ya pêşîn de dîtibû, lewre ewî û weke ku, bi pîrekên din re dikir, ew bi gotinên romantîk nêzîkî wê nabe, lê tevî evê naskirinê jî, ewananikarî xwe ji akama ewê sinciya ku, li ser hatine xwedîkirin ku, gereke yek nêçîr be û yê din jî nêçîrvan be, rizgar bikira û hertim ewê nêcîrvan be û ewa din dê niçîrvan be.
- Weke ji min re gotine û belkî ewana mafê te nedabin jî; yek zû-zû nikare te bigre. Ev cara pêşîbû ku, Koçer rastî pîrekeke wilo aşkere tê ku, ew gotina xwe seranser dibêje.
- Weke xûya ye ku, tu pir titştan li ser min dizanî. Ewî dixwest zûtir nasbike, ka ew çi ji wî û evê hatina cem, dixweze.
- Tu pir di dora tiştan re digerî.
- Mirov sinc û kesîtiya xwe ne bi destên xwe ava dike û pir gerekê me ye ku, em di rûyê hev de bibêjin: tu korî. Koçer xwest hinekî barê ku, ewê avêtibû ser milên wî sivik bike.
- Ne xeme, ezê çêrokê verşînim, tevî ku tu nepirsî ka çima ez bê rêdan û naskirin hatim mala te.-... Dûmahîk Rûpel: 23

**ZAROTIYA NEYNIKEKÊ Û TIŞTIN DIN ... Dûmahîk:**

-Em cîranin û ji mafê cîrêne ku, li cîranê xwe bipirse û di êvarên înê de lêxwedî derkeve; şîv û xwarinê jê re derîne. Koçer di bin çavan re lê dinire û dinase ku, ewê nameya wî fêmkir, lê ewê guhê ker tê alkir.

- Bes gerek, hûn ên kevin, li me bipirsiyana û we bigota; ka evên nuh hatine kîne û çi gerekî wane.

- Bila hûn ên camêrbin û emê tola ewê yekê vedin û li şûna carekê, emê du-sê caran bên. Bes we dixwest çêrokekê ji me re salix bidin, de ka keremke. Koçer dixweze ewê dezî, careke din, bi dest xwe ve bîne û nasbike ka ew çi dixweze.

- Çêroka Kalemêr çiye, ez dixwezim jiyana wî ya li vir nasbikim.

- Çi çêrok û çima çêrokên wî ji min tên xwestin û tu çi ...

- Hêdî-hêdî, ji berî her tiştî; çima ji te. Weke ku min ji cîranên we yên li vir bihîstî ku, di evê dawiyê de dostaniyeke kûr di navbera te û wî de çêbûbû, lê ne ev tenê sedeme, belkî sedema sereke û weke ku, ji min re gotine; nêzîkbûneke pir mezin di navbera te û wî de heye. Koçer bi evê gotinê re vedicinîqe û tê bîrê ku, ewî berê ev gotin bihîstî, lê kengî û li kuderê nayê bîrê. Hema çi çêrok, çêroka ewî û gulên sor di zivistanê de û ev çêroka mirina wî ku, bibû pilindir, ka heya bi ku rastin. Jinik pirsên xwe aşkere dike.

- Qey ji te re gotine ku ez, kêlîk bi kêlîk, bi wî re bûm an ez veşargeha razên wû bûm. Pirsên wê û naskirina sedema hatina ewê hêştibûn ku, dest û pê li Koçer sar bibin.

Piştî ku ew hinekî din bi çêroka Kalemêr diaxifin, ew radibe ser xwe û rêdana derketinê ji wî dixweze, ewê hîngê tê bîra Koçer ku wan rûniştina xwe bê vexwarina titiştî qedandibûn û gava ji ewê dixweze hinekî din bimîne, da ku, bi erkê xwe rabe û qehweyekê ji wê re çêbike, ew destên xwe dirêj dike û dibêjêyê: “bila careke din be”. Di derî de çavên wan, careke din, li yên hev rast tên û dihêlin herdu di cihê xwe de, heya bi demekê, bê liv bimînin.

Gava ew vedigere oda xwe û xwe li ser kenebê dirêj dike, bi çavên evî xortî dirame, ka ew weke yên kê ne û kê bi bîra wê tînin û ji berî ku, karibe weke hercar xwe bi piyaleke mey winda bike û tif li riwê hemû mêranke, bûyerke kevin, weke ku xewnek be; “na, ew roj, dê ti carî ji bîra min neçe û ne jî ew herdu çavên wî yên reş”. Bi gotina xwe re ew ber piyala nîv dagirtî ku, hîne ji duh ve li ser masê mabû, diçe û her ku ew piyaleke nuh dadigre, bûyer giran û sayîtir dibe, tu dibêjî qey wê bi meya piyalan re vala hundirê xwe dike.

Ew hîne çardesalî bû û wan mala xwe ji gund anîbûn û li nêzîkî kaniya Betmanê, erdek kirêkirbûn û di gel malbatê li wir bi cih bibûn; bavê wan xwestibû û nemaze piştî ku, pirik ketibû nav pêz û ji bilî çend kuleka ji wan re nehêştibû, şansa xwe di çandiniyê de jî bibîne. Lew re wî ew erd bi ewan çend kulekan guhart û hinek şînkayî çandiye. Ew mîna gêrikan, ji berî ronahiyê û ta ku ro diçû ava û pir caran, li ber tava heyvê jî, ranediwestîn û her ku gorepana şînkayiyê firehtir dibe, hêviyên wan jî bêtir dibin. Û di rojekê de, ji yên ewê havînê, ew çend mirovên wan ên ji gund hatibûn, li wan dibin mêvan û dihêlin dilê keça çardesalî û mina çivîkeke serjêkir, di sînga wê de bipirpite; bi dîtina hevalê xwe yê lîskê re, ew pir bûyer û çêrokan bi bîr tîne û eger ku, ne ji tirsa dê ba, ewêyê di cih de bi destên wî bigirta û ewê bi nav baxçeyên şînkayiyê de birevanda. Lê tevî evê tirsa xwe jî ew bê liv û tebat nema û her çendekî carekê û bi boneya tiştekî dihate hundir û ramûsaneke veşrtî ji hevalê zarotiyê re dihêle.

Lawik jî têra xwe diqij-qije û pir caran dike ku, hemû bend û zincîran biçirîne; ew li rê û derfetekê digere ku ji civata wan rabe û derkeve bi hevala lîskên zarotiya xwe re dûr bireve, lê çavên civatê tev îro li ser wî ne û wî bêtir bi cihê wî ve girêdide; ew îro paşayê rûniştinê ye û gereke li gor navê xwe yê îro bi-giranî bilive, rabûn û rûniştinên wî giş bi bîrwerî bin û bi carekê birînekê têxe navbera lîskên zarotiyê û rewşa xwe ya îro. Keçik diya xwe hembêz dike, dike ku parsiwên wê bişkîne, lê bi dîtina ewî golikî re, dê dihêle û ber bi ewî dibeze, seriyê wî dixe hembêza xwe û bi dengekî bilind di guhê wî de diqîre: ez ji te hezdikim. Dihêle hin ew û hin jî xortê ku, li hundir weke paşakî radibû û rûdinişt, ji cihê xwe bireve û dilê wî bête guvaştin.

Bi boneya derketina avrêjê, ji nirîn û bend û gerdişan bazdide, diya keçikê jî dêng li qîza xwe dike ku, ew were û avê li destên wî ke. Keçik ji hembêza ewî golikî derdikeve û ber bi yê derve ve dibeze. Bi rasthatina çavan re û girtina destên hev re, lîskên wan ên li ber karikan û di piş mêwên tirî de, di çavên ewana de derdibin. Wan pir caran xwarina xwe bi tevayî; bêyî ku pariyekî jê bixun, vedigerandin mal û dihêştin diya wan bi loman bi wan keve ku, çima ew nanên xwe naxun. Lîskên wan ên ku ji sibê de dest pê dikir ne dihêşt titşt bê bîra wan û ne jî dizanîn çawa ro diçe ava.

- Tu bi min razî yî.

- Keçik dikene û hinek av li seriyê wî dike.

- Ez ji te hezdikim. Bi gotinê re destekî wê digre û diguvêşe.

- Tuyê îro li vir bimînî. Piştî ew li deriyê odê dinire û dibîne ku, birayê wê yê mezin li wire û bi çavne sor li benda vegera Êho ye, ew kenê xwe vedişêrin û bersiva wî nabîse. Lê ji berî ku ew di deriyê odê û reşiya wê wer bibe lê dizîvire û seriyê xwe bi jêr ve dihejîne, dihêle ew bi ken û careke din, diya xwe hembêz bike.

Dê, ew cara paşin be ku riwê Êsmê bibîne; bi ketina hundir re û vegirtina destên kesên rûniştî re, ew jî herdu destên xwe bi jor ve vedike û piştî kurtepistekê dibêje: amîn. Û bi pozbilindî ber bi cihê xwe diçe, lê dengê bavê wî û xwestina ku, ew jî alî zaroyan bike, da ku, tiştên şîraniyê bînin, dihêle ew hinekî bibehite û bi çavekî nerazîbûnê li wî binire. Lê kenê wî yê bilind dihêle ew wê tehliyê daquretîne û pîspîs sênîkên xwarinê li ber civatê rêz bike.

- Bavê Êho te nirîna kurikê xwe jî birî, yan tu li ser destên xwe bi evê yekê radibî. Yek ji civatê henekekê berdide.

- Ê hîne dema min diya wî stand min raya wî nebir. Bavê wî vedigerîne û civet tev dikene, heya bighe Êho. Lê gava ku bavê keçikê dixweze fêm bike, ewê pîreka nuh bi ya berê re bide rûniştin an dê cihekî nuh ji wê re ava bike, çav di seriyê Êho de gilok dibin û pariyê xwarinê di gewriyê de dibe çiqina maran.

Ew hatibûn da ku Êsmê ji Êho re bixwezin, lê gava çavên Kalemêr li bejin û bala wê dikevin, nêta wî pîs dibe û navê zêve diguhêre; li şûna ku wê ji lawê xwe re bixweze, ew xwe dide pêş û bi bavê wê re dibêje: kêr a te ye û stû yê mine, tu çi dixwezî ez amedeme. Û wî berdana jinika berê; diya Êho û serjêkirina kurikan jî dabû pêşiya wan, ku ew amedeye ewan jî ji Êsmê re bike qurban.

- “Belê.. ewe”. Koçer dibêje xwe û bi bîr tîne ku, dema çavên wî bi bastûnê Kalemêr ketibû, ewê hîngê û tenê di bastûn re naskiribû ew kiye. “Ev çi lihevhatineke dîrokî ye; kê bawer dikir ku piştî bîst salan emê rastî hevdu bên û çawa. Êsme.. Kalemêr; Kalemêr an bavê min, ti cudayî nîne, herdu jî peyvin û ji hev ne dûrin”.

Ewî dikir hîne bi bîranînên xwe de biçe, lê reşantiya ku dikeve derî dihêle ew rabe ser xwe û pêşwaziya Stêrê bike.

Ew cara pêşiye, piştî bîst salan, di riwê hev de radiwestin. Koçer reva xwe di çavên wê de dibîne, ku çawa ew bi boneya ku here û kuxa xwe li derve biqedîne û çareyekê lê bike, ew dide ser riya nevegerê û dîrokê bi hemû efsan û kesên wê li şûna xwe dihêle. Ew roj û ev roje ku ew dîroka wendakirî û heya dema ku, bastûnê bavê xwe, di des de dît ku wî çawa balîv ji hev êxistibû jî,- **... Dûmahîk Rûpel: 24**

# DILNAME

Rojnameyeke Rewşenbîrî ye Serbixwe ye

9

1-9-2011


**ZAROTIYA NEYNIKEKÊ Û TIŞTIN DIN ... Dûmahîk:**

-ev dîroka wenda venegerand. Lê vaye çavên Êsmê û careke din, hertiştî bi bîr wî tînin û nîşandeyê katijmêrê bi şûn ve vedigerîne.

- "Na; ezê nehêlim ku careke din ew dîrok vegere.. . Tu îro Stêr e û dive tu bimînî Stêr". Koçer gote xwe û bi carekê re ew dîrok û çêrokên wê ji bîranînên xwe bi dûrxistin. Wê jî tekûz kir ku, evê di pêş wê de rawestiye, ewê ku di rojekê de ling dane bê û li şûna xwe xewnin beravêtî hêştibû ye. Lê tevî evê têgihêştina
xwe, ewê jî ew biryar girtibû, ku gereke çêrokên dîrokê ji dîrokê re bihêlin û ewî weke Koçer binase, ne weke ew xortê gundî ku, bi navê Êho naskiribû û pir şev di qurzîkên reş de bi hev re borandibûn.

- Koçer tu piyaleke av bi min re venaxî. Stêr jê dipirse û dihêle Koçer û mina ewê ku, hezar piyalên mey bi ser xwe de kiribe, bê deng bide dû wê. Di ro-nîvro de û di bin nirîn û dîtina hemûyan de, ew dikevin hundir. Şêrîn pir bizav kirin ku, karibe dakeve cem wî û rê li ber wan û riya windabûnê bigre. Lê diya wê, her carekê, kelemek li ber derdixist û rê li pêş digirt. Û dema ku dît Koçer daye dû wê, naskir ku ew bi carekê winda kir; ew jî bû wêneyeke rizyayî ji yên jiyana Koçer.

Ketina wan a hundir û di bin nirîna tevan de, li dilê piran zor hatibû û xwestin êrîşiyeke giran bajon ber deriyê pîreka rûşiştî, lê her yekî digot: "bila yekî din dengê xwe di pêşî de bilind bike". Koçer jî bi derbasbûna xwe ya hundir re û dîtina ewî zaroyê sê mehekî, naskir ku têkeliya Kalemêr û bi kêmanî heya berî salekê jî, bi Stêrê re ajotiye. Koçer kûr li çavên zaroyê sê mehekî dimeyzîne, ew wêneyê xwe û Kalemêr di wan de dibîne û dema ku, Stêr rûbendê davêje ser wî, Koçer dipirse.

- Te çima çavên wî veşartin. Bi pirsa wî re, Stêr piyala xwe hildide ser lêvan û dikene.

- Ew dîroka mine û çênabe ku, yekî din bixwîne. Bersiva wê jî bihna bivetiyê bi wî dide naskirin, lew re ew jî direve piyala mey.

- Ava tirî şêrîne. Koçer dibêje û dihêle Stêr bi bîst û pênc salan bi şûnde vegere; ewan rojên ku li piş mêwên tirî rûdiniştin û teneyên tirî yeko-yeko diguvaştin ser lêvên hevdu û bi her teneyekê re şerbeta wan ji ser lêvên hevdu dimêtin, bi bîr anîn.

- Lê îro, ew hinava yekî dikewîne. Bersiva Stêrê jî dihêle ku, ew careke din jiyan î dîroka îro bi bîr bîne; reva ji mal û ji pêş lehiya bav, jiyana windabûnê û hevalan, naskirina bastûn û çûna Kalemêr, gulên sor û Şêrîn .. Û her diçe riwên neynikan pir dibin.

- Jiyan reveke, ji bûyînê ta winda bûnê. Belê jiyan reveke tisî ye. Koçer dibêje û dîke li çavên Stêrê dimeyzîne, lê gava ku wêneya Kalemêr tê de dibîne, ew çavên xwe li ser wê wêneyê dide hev û piyala mey hildide ser lêvan; kalemêr jî û mîna hercar, tilbijiya xwe derdixe û wan mûyan li hev badide. Bi siwarbûna li pişta Hespê Rewan, ew ber bi ezmanan ve hildikşe û li wê dibe mêvan. Na .. na; jiyan çemeke meye, her ku tu jê vedixî, tu bêtir tihî dibî. Di cara dawî de, Kalemêr rahişt gula herî xweşik û ji sîngê Êsmê kir û nîşanî wê da û piştî pir cixare û hêsir gote wê: "tu yê ewê bidî wî".

Bi dîtina ewê gulê li ber xwe û weke ku, cinekî ew li ber ewî danî be, Koçer bi mestî lê dinire: "belê ewe; gula ku Kalemêr ji Şêrînê re tanî bi xwe ye. Bes heya nuha ew li ku bû û çima çavên min pê neketin".

- Ew ji te re ye. Gotina wê jî wî bêtir ditevizîne û dihêle ku, Koçer rahêje wê û wan sê mûyên dûvê Hespê Rewan, ku li dûvikê gulê hatibûn alandin, li hevdu bade.. . Û bi siwarbûna li pişta wî, ew ber bi ezmanan ve diçin û .. diçin.

**- 14 -**

Ew û Hespê Rewan, di ezmanên tariyê de, winda dibin..

**... ( Dawiya Romanê ) ...**

## BARŞALONA SUPERÊ EWOPA 2011

**BARŞALONA (2) × PORTO (0)**



Di roja 26-8-2011an de, tîma Barşalona ya Ispanî bi 2 golan bi Sifrê li beramber tîma Porto ya Purtugalî li Monako bi ser ket, û Çaremî car di dîrokê de bû Superê Ewropî.

## BARAZÎL LEHENGÊ CIWANAN 2011

**BARAZÎL (3) × PURTUGAL (2)**



Di roja 21-8-2011an de, Hilbijarteya Barazîl ya Ciwanan bi 3 golan li beramber 2 golên Hilbijarteya Purtugalê ya Ciwanan li welatê Kolombiya bi ser ket, û bi vê xula 2011an ya Cama Cîhanî ya Ciwanan, dibe cara Pêncan ku Barazîl qehremane wê ye.

## SUPERÊ ISPANIYA 2011 BARŞA YE

**BARŞALONA (3) × RIYAL MADRÎD (2)**



Di roja 19-8-2011an de, tîma Barşalona bi 3 golan bi 2 golan (5-4) li beramber tîma Riyal Medrîd bi ser ket, û bû 10mîn car ku di dîroka xwe de dibe Superê Ispaniya di fotbolê de.